

Wezîrê Çandê yê  
Hikûmeta Kurd a Federal  
Şerko Bêkes:

Du tiştên  
ne xweş çêbûn

Rûpel 3



## Têkoşîna Neteweyî ya Kurd polîtîkaya cîhanê diguherîne

**W**elatên Rojava û Amerîka, polîtikayêن xwe yênder barê Kurdistanê de li gor mercen nû diguherînin. Hevdîtinêن wan ên bi PKK'ê re, nişana demeke nû ye. Di vê dema nû de, PKK wek nûnerê têkoşîna rizgariya Kurd tê qebûlkirin. Ên ku heta doh ji PKK'ê re digotin terorîst iro pê re rûdinêن û dîtinêن wê digirin.

**L**i Rojhilata Navîn têkoşîna gelê Kurd û pirsgirêka Kurdi, di rojeva welatên împeryalist de, di xala yekemîn de ye. Hevdîtinêن Filîstîn û Îsraîl didomin. Li gor ku kîş bûye dê bi otonomiya Gazze û Erîxeyê encam bê girtin. Bi vê encamê re, dê welatên Rojava û Amerîkayê bi pîrsa Kurdi re bêhtir dakevin. Ev jî bi nasîna hêza Kurd dibe.

Rûpel 8



# Çi! Tirkê Azerî bûne dostên Kurdan?

Min di rojnameya Welat hejmarâ 77 an de, nameya hevalî delal bi navê Ahmetê Hopo ji Bakû/Azerbaycanê xwend. Ez ji vê yekê ku wî hevalî heya niha çend pirtük bi zimanê Kurdi weşandine û ji sala 1991'ê vir ve navgina çanda Kurdi li Bakûye heye, zor dilxwes bûm.

Lê nameya wî hevalî dîroka zû baweriya me Kurdan, a xemgîn û tijî derd û êş ji anî pêş çavên min.

Em gişt dizanîn, lê dersê jê wernagirin ku her gav dijmînê me bikevin tengasiyê, ji dilsaffî û bêramaniya me ji bo meram û meqsedêne xwe ên nebaş û pîs sûdê werdigirin û paşê ji, me, ew dostê wan ên giranbuha û qehreman li ser qêf erdê dixin û dibin lingêne xwe de difetisînin.

Em di dîrokê de pîr dûr neçin, tenê bi hinek mînakêne sedsal bîstan mêze bikin û çend pirsan ji xwe bikin.

Kemal Atatürk di şerê rizgariya Tirkiye de çi soz dane me û çawa em pesinîn û paşê ji, ci anî serê me.

Tirkan çawa ji civaka feodaliya eşîrêne Kurd Alayıyên Hêmîdiye çekirin û em ji di qetliama gelê Ermenî de kîn şîrik. Di serhildanê Şêx Seîd, Se-

yîd Riza û di bûyera Koçgiriyê de, çawa bi navê sunîfî û elewiyyî bi gelê me hat listin û di dawiyê de ci hate serê zarok û zêcén me.

Qazî Mihemed serokê Komara Mehabad û kabîneya wî, çawa ji rejîma Şahî Iranê bawer kirin ku, ew ji bo raçevkirina (kontrola) hilbijartînê têne Kurdistanê û paşê ji ew girtin û bi darve kirin.

Di salêن şestî de li başûrê Kurdistan çawa Berzanî û Te labanî berdane canê hev û hevdan qirkirin û paşê ci bû? Bindestbûna Kurdan.

Şahî Iranê çawa di salên heftê de, medhîn Kurdan kir û Iranibûna wan derxist meydânê û paşê ci anî serê wan? Hikûmeta Humeynî çawa di salên heştê de Kurden rojhîlatê Kurdistanê bi destên Kurden Başûr (Barzanî) dan qirkirin û paşê ci bû? Bindestbûna Kurdan. Di şerê Iran û Iraqî de, çawa herdu aliyan bi Kurdan listin û nehiştin ku ye kîtiya wan saz bibe û ew di a gîrê şer de şewitandin. Ma qetliama Helepçeyê ne neticeya vê siyaseta çewt bû?

Serhildana gelê Başûr di sala 1991'ê de, bi banga Amerîkayê çawa zû hat bawerkirin û paşê ci bû? Ma ew musîbeta

giran ne neticeya vê baweriye bû? Bi zora kî û listikên kî parlamento ya Başûr bîyar wergirt ku, divê PKK ji welatê xwe, başûrê Kurdistanê derkeve? Şerê Cotmeha 92'an çawa çebû? Bi zora kî? Kî hat a likariya kî û çima?

Gelo parlamento ya Başûr çima heya niha hîn ji heye?

Çi ye, sebeba hebûna wê?

Gelo çima hinek ji Kurdan baş in lê yê din nebaş in?

Gelo çima nûneren hemû partiyen dewleta Tirk di kon geraya KDP'ê de amade dibin ewen ku heya niha ji wê partiyê û wê parlamento ya nasnakin û alikariye pêşkêş dikin?

Gelo çima Azeriyen nete weperest û şoven, gelê me yêni li Azerbaycanê ku ji kokê ve tune kirine û bi zor û lêdanê ew ji çand û netewetiya wan dûr xistîne, taze ji nû ve bûne dostên Kurdan? Mafen çandî û mafê qisadanê di radiyo yê de didine wan?

Ma gelo Kurd berî 1991'ê li Azerbaycanê tune bûn?

Gelo di radiyo yê de, di vê dema şer de, ci tê xeberdan?

Ma gelo Azerî bi qetliama gelê Kurd bi destên birayen, wan ên Tûranî ci dibêjin?

**Borzo, S.D.**

## Ji xort û keçen Kurdistanê

Xort û keçen hêja, bi destûra we ez dixwazim silavêne şoreşgerî ji rojnameyê Welat û Ö. Gündem'ê re binivisînim. Xort û keçen qehreman, ez di Girtî geha Kemalpaşayê de me. Îcar ez difikirim. Hûn dê bibêjin çima? Ez li ser şehîdên Kurdistanê û li ser dayîk û bavên şehîdan difikirim. Her ku ew qehreman tên bîra min, ez radibim ji ba hevalîn xwe yêngirtîgehê diherim di qun cikekî de rûdinim. Bi dizî ji xwe re digirîm û dikelim. Çavên min ji girînê sor, lê dil û hinavê, min piçekî rehet dibin. Berxwedan û serhildan di serê min de diljîlin. Hele ku qehremanen wek Mazlûm, Kemal, Egît û piş re Berxwedan Berîtan'ê tên bîra min, agir ji çavên min diçe, hemû derê min rehet dibin.

Mêze bikin ez li ser bêaqil bûna xwe û li ser berî ku ez bêm girtin ewqas rî li ber min vekiribûn û têkoşîna me wek neynikê ji min ve xuyabû, lê min li kîf û zewqa xwe mêze dikir. Pere pîr bûn. Ne ku min nîzanibû têkoşîn heye.

Min eynî mîna we zanibû ku, têkoşîn berdewam e, lê hema destê min ji bêseref bûnê nedîbû. De vê carê mêze bikin ci hat serê min. Sala 1991'ê, Panzdehê Tebaxê, min ji di wan rojan de texsiyek bi şenedan kiribû. Panzdehê Tebaxê, roja qehremaniya Egitân bû, lê min nîzanibû ew tiştê wilo ci ye. Ez wê rojê li sûkê, li ser texsiya xwe bûm. Hevalekî baş hate ba min, gote: "Min bibe malê", "Min ji rabû ew heval bir mala wî û ez vege riym ku herim mala xwe. Di vê navê de texsiya min xerabû û ez sekînîm. Şev bû, min mîze kir ku, mînibûsa polisan li nik min sekîn û gotin: "Tu li vir ci dikî?" Min got: "Texsiya min xerabûye." Gotin: "Kanasa nameya te." Min tevî ew raqêñ texsiyê dane wan, he ma polisekî xwe avête min got "Tu Kurd i, ji Mîrdînê yî" û destê min girê dan, ez aveti me mînibûse. Ez birim li min dan, zilm û zorî li min kirin, xeberen nebaş ji min re gotin. Gotin bila Apo' were te xelas bike, ceyran dan min. Ji ber

ku ez Kurd bûm ew zilm bi min kirin. Heke ez zilm û zora dijmin hemû binivîsinim di roj nemeyê de cih namîne. Em dîsa vege rin ser bêaqilî, girî û nebaşya xwe. Ewqas serê min li binguhê û diwaran xistin, dev û pozê min pelişandin, ez kîrim mîna netîş û ez aveti girtîgehê. Hîn niha hişê min hate serê min. Gelî xort û keçen qehreman, ez hîvî ji we dikim. Berî ku tişte kî bi vî awayî bê serê we, berî ku dayîk, bavê we û we bigirin, destê xwe zû biavêjin têkoşîna Kurdistanê. Ji cihê ku em bigirîn bila vê carê dij min bigirî. Em xwe bi gulên berxwedan bixemîlinin.

Ez dixwazim li ser şireta Apê qehreman, Apê Musa nîvîsa xwe xelas bikim. Mêze bikin Cinara Kurdistanê ci gotiye: "Geli keç û xorten Kurdistan we heta iro guhê min bir. De wa têkoşîna we ji iro pê ve îca ez we bibînim." Hûn hemî berxwedan bin.

**Bavê Xalo  
Girtîgeha  
Kemalpaşa'yê**

## Nîvîsara Welat

### Xwendin ne bes e!

Xebat û amade kariyê me yê ber bi nûkirina Welat ve didomin. Hefteya çûyî em li ser pêdivi ya guherîn û xwenûkirin sekînîn. Emê gelek carên din ji li ser vê babetê binivîsin, guftûgoyan bikin çewtiyên xwe tesbit bikin, û di nav plan û programeke bi rîk û pêk de van kêmâsi û çewtiyân ji holê rakin û guherîn pêwist pêk bînin. Pişti tesbît kirina kêmâsiyê xwe û yêni rojnameyî, emê ji pirsgirêk herî girîng û berbiçav dest bi lêgerîna dîtina riyen çareserkirina wan bikin û bi ber rojnamegeriye hemdem ve gavêngirîng biavêjin.

Niha, bi giştî du celeb pirsgirêk li pêşîya me xuya dikin. En ku emê bi xwe çareser bikin û yêni ku bi pêşniyar û piştgiriya xwendevanen xwe emê ji binî derkevin.

Kêmâsi û guherînê ku ji aliye xebatkarê navenda rojnameyê ve ji holê bêr rakirin û bê pêkanîn; form, mîzanpaj, naverok û kadro ne. Di wan mijaran de, em guherînê bingehîn difikirin û hewl didin ku, rojnameyeke delaltir, xurttir û mezintir pêşkêşî xwendevanen xwe bikin. Di vî warî de xebatên tund û hewldanen mezin pêwist bin ji, çareserkirina wan zêde ne zehmet e. Emê di pêş de, bi firehî li ser guherînê nû, we agahdar bikin.

Pirsgirêk dijwar û zehmet êdî zehf yêni ku em çareserkirina wan hinek bi piştgiriya xwendevanen xwe ve mumkûn dibînin. Ev pirsgirêk bi giştî, tîraj, abonetî, xwendin, danxwendin û hwd in. Çareserkirina wan ji bi xwedî li derketina Welat ve girêdayî ye. Her xwendevanekî Welat lazim e di vê pîrsî de xwe brpîrsîyar bibîne û xwedîderketina li zimanê xwe wek peywîreke zarûrî bibîne.

Li bakûrê Kurdistanê rojnameyâ hefteyî ya xwerû bi Kurdi tenê Welat e. Welat hem li çar perçeyen Kurdistanê, hem ji li hemû welatên ku Kurd lê dijîn belav dibe. Tevî vê yekê tîraja wê ji çar pênc hezarî derbas nabe û hejmara aboneyen wê kêmî pênc sed kes in.

Xwendina zimanê Kurdi û pêşvebirina rojnamegeriye Kurdi ji bo serkeftina têkoşîna neteweyî girîng e; divê neyê ihmalkirin. Ji bo serkeftina vî warî berpirsiyariyeke mezin dikeve ser milen xwendevanen Kurd ên ku ji xwe re dibêjin welatparêz û rewşenbir. Lê tenê bi xwendin û nîvisandinê ji serkeftina di vî warî de ne mumkûn e. Her wiha divê xwendevan Welat bidin xwendin û me ji kêmâsiyê wê agahdar bikin. Li aliye din, hêzên dewletê nahêlin Welat bigîhî destê bayyan, an ji zehfîn bayyan newêrin Welat bifiroşin; têr tehdîtkirin. Bi riya abonebûn ev problem, ne bi temamî be ji dikare çareser bibe. Bi wî awayî rojname bi rîk û pêktir dikeve destê xwendewanan.

Hedefa me ew e ku, tevî her cure rîlibergirtinê dewleta Tirk, em Welat bi rîk û pêk bigîhîn xwendevanen û tîraja wê ji, hefti bi hefti zêde bikin.

Lê ji bo vê, wek me li jor ji got, pêwist e em giş bi hev re xwedî le derkevin û bidin xwendin.

Özal digot: 'Bila zimanê Kurdi û xwendina wê li dibistanan serbest bibe, çawa be Kurd bi xwe ji zimanê xwe naxwînîn.' Em ji dibêjin li hember van gotinê Özal emê li zimanê xwe û rojnameya xwe xwedî derkevin, bixwinîn, bidin xwendin û bi pêş ve bibin. Bila dijmin negihîje meq seda xwe. Ber bi xwendin û danxwendina Welat ve!

## FERHENGOK

**Çewlik:** (Çiftlik, farm)

**Demirandin:** Qusandin, niqandin (Kismak)

**Diljar:** Xemgîn, xembar

**Dilkêş:** Bicazîbe, (atraktiv)

**Dilzîz:** Diltenik

**Dilkêşî:** Cazibe (atratsiyon)

**Hilberîn:** Üretim

**Hilberî:** Ürün

**Hilbirandin:** Üretmek

**Kolit:** Xaniyê ku di demeke kurt de bê rîdana dewletê tê çekirî (Gecekondu)

**Kurtejîn:** Biyografi

**Kurtepêl:** Pêla kurt

**Kuşdar:** Yê ku dikuje, qatil

**Kuştî:** Yê tê kuştin, (qetilkiri)

**Pergî:** Rastî, Leqayî

**Rasterê:** Rasterast, Direktif

**Rastîbîn:** Reâlist, gerçekçi

**Rastîbînî:** Realizm: Gerkeçilik

**Rihel:** Cihêz

**Saw:** Tirsa bi şik, tirsa veşarı

**Serejîr:** Serbejî: Berjîr

**Tima:** Nemerd, (Cîmrî)

**Tol:** Gêr, Gindîrbûn

**Tomarkirin:** Dagirtin (Doldurmak)

**Xalîce:** Xalî (Halî)

**Xwînkêm:** Anemik

Wezîrê Çandê yê Hikûmeta Kurd a Federal Şerko Bêkes:

# 'Du tiştên ne xwes çêbûn'



Wezirê Çandê yê Hikumeta Kurd a Federal Şerko Bêkes û Serokê Kargêriyê ya Enstituya  
Kurdî Şefik Beyaz di gel hev.

**Navenda Nûçeyan-** Wezirê Çandê yê Hikûmeta Kurd a Federal li Kurdistanê Başûr Şerko Bêkes, di 1'ê îlonê saet li 19.00 êvarê li Navenda Çanda Mezopotamyayê civînekê ji bo çapemînî û weşanxaneyen Kurd çêkir. Bêkes, di civînê de ji sê saetî bêhtir li ser rewşa başûrê Kurdistanê agahî da besdaran.

Bêkes di civîna ya ji bo çapemînî û weşanxaneyen Kurd de got ku di dema hikûmeta wan de du tiştên nexwestine çêbibin qewimîne, yek jê cinayetên "kiryar nedîyar" û ya din dadana rojnameya Welat ku li Başûr bi Soranî derdiket.

Şerko Bêkes li ser rewşa aborî, çandinî, ticaret, leşkerî, siyasî, çandeyî, hiquqî,

perwerdehî û hwd. peyivî, besdaran der barê Başûr de kir xwedî agah. Pişti peyvîna xwe dorê da pirsên besdaran.

Di dema bersivandina pirsan da li ser mijara cinayeten "kiryar nedîyar" û dadaña rojnameya Welat rawestîya. Bêkes wiha axivî. "Di dema hikûmeta me de du tiştên ku em jê dilnerihet in, yek jê cinayetên kiryar nedîyar û dadana rojnameya Welat e. Ez bi xwe li hember van tiştên bêqanunî derketime û min vê rewşê wek raporek amade kiriye û daye Mam Celal Telabanî." Rojnameya Welat li başûrê Kurdistanê wek hefteyî û bi zarravayê soranî derdiket.

Bêkes di gel ew çespîn û kirin, rewşa Başûr li gorî

Bosna-Hersek û Afganîstanê baş nirxand, heta daxuyand ku cinayetên kiryar nedîyar li Sewêdê ji têr kirin.

Li ser têkiliyên Hikûmeta Federal û neteweyen biyanî vê rewşê anî ziman: "Têkiliyên hikûmetê li gorî PDK û YNK'ê gelek jar û paşvemâyi ne. Ên hizban ji yên me xurttir û germtir têkiliyên wan bi derive re hene."

Di civîna ji bo çapemenî û weşanxaneyen Kurd de ji Bêkes daxwaziya parastinê xwedî lê derketinê û piştgiriya Başûr ji besdaran kir.

Wezîrê Çandê Şerko Bêkes di roja 2'yê mehê de çû Ewrûpayê û dê bi rëxistinê çandeyî û wezîrê çandê yê İngîlîstan, Fransa, Almanya û Swedê rê têkîlî deyne û ji wan alikariyê bixwaze.

Rêxistina Efûyê, li ser şerrawestina PKK'ê ya yekalî ji radiweste û dadixuyîne ku, di dema şerrawestinê de di warê mafêni mirovan de, bi awayekî erêni pêşveçûn pêk hatine, lê ev rewş bi xerabûna şerrawestinê re guheriye. Di raporê de, pest û pêkutiyên ku li ser gundê Kurdistanê têne meşandin ji, bi awayekî fireh cih digirin û agahiyê bi belge têne dayîn. Li gorî raporê, li ser

# Rapora Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî

**Navenda Nûçeyan-** Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî rapora xwe ya 1993'yan weşand. Rêxistina Efûyê li ser Kurdistanê û kîrinê Dewleta Tirk ji bi giranî radiweste û Tirkîyeyê bi îhlalkirina mafêni mirovan súcdar dike. Li gorî raporê, di sala 93'yan de li Kurdistanê îhlalkirina mafêni mirovan ji salên din bêhtir û rewşa jiyanâ Kurdistan dijwartir bûye.

gundênu ku cerdevaniyê na-pejînîn pest û pêkutiyên tîm, cerdevan û cendirmeyan ji her demî dijwartir di-domin. Rêxistina Efûyê de rapora xwe ya 1993'yan de, ji bo belge ji gundê Kurdistanê yên ku li wan qetîam pêk hatine û vala bûne nîşan dide. Di raporê de, gundê Banê ya Şirmexê ku di 20'ê Sibata 1993'yan de bi êrîşa hêzîn dewletê hatibû xerakirin ji, bi giñgî cih digire.

# HAWAR

## Dilbixwîn

### 'Êzîdî kultura Kurdan in'

**E**m êzîdî ne, ne Kurd in. Êzîdî û Kurditî du tiştên ji hev cuda ne. Tu caran du neteweyen ji hev cuda na-bin yek netewe. Kurd dijminê me ne. Ew misilman in, em êzîdî ne. Ew bi Kurdî diaxifin, em bi êzîdîkî. Ew Kurdishtanê welatê xwe dibînin, em ji tu caran nikarin xwe ji êzîdîstanê qut bikin.

Zerdeş ne Kurd e. Ew êzîdî ye, pirtûka xwe bi êzîdîkî nivi-sandiye. Ew ji êzîdîstanê bûye... em neviyên Yezid Bin Muaviye ne. Şêx Hadî şêx me ye, Kurdistan rizgar bibe ji, dîsa tiştîkî me di wê Kurdistanê de tune ye. Wê dîsa misilman me bidin bin daran. Ëm dîsa di bin destê Kurdistan de binalin. Karê herî baş ew e ku em ji bo Êzîdîstan xwe bixebeitin..."

Cih bi cih ev gotinê bêwate (mane) fiş û vala xwe li guhê mirov diqelibînin. Mixabin cure kesen ku nikarin bifikirin û pirsan şîrovebikin tavilê bawer dikin û dibêjin: "Erê em ne Kurd in." Dema ku mirov ji wan dipirse: "Hûn ci ne?" Bersivê bi hêrs didin û dibêjin: "Em êzîdî ne." Zarokên xwe ji li ser vê bingehê mezin dikin.

Kurdistan weke sindoqekê ye, tu li ci bigerî dikarî di wê sindoqê de bibîni. Elbete di wê sindoqê de wê kesen wiha ku ji civakê hatibine avêtin û rûreş bûbin werin dîtin. Gelekî normal e!

**Êzîdîkî, Êzîdîstan tune ne. Kurdi û Kurdistan hene. Bila em di agirê dijmin de neşewitin û careke din pişta xwe li hemberî neyaran xûz nekin.**

**Kesen ku gotinê wiha "Em dijminê Kurd in" dibêjin, ew peyayên dijmin in. Neyarên gelê xwe ne.**

**Tenê riyek heye me rizgar dike. Riya diçe Kurdistanê. Ew rê dîn, kultur, ziman û hebûna me diparêze.**

Li vir ez naxwazim lêkolîneke dîrokî binivisînim û rîveçûna Zerdeşte Pêxember, çîroka nivîsandina Zend A-vista, şewitandina pirtûkî ji hêla Îskenderê Mezin ve, da-girkirina Kurdistanê û qebûlkirina dîne İslâmî û diliwgeriya Tirkan li ser Kurdistanê, li sedsalâ 11'an de bînim ziman.

Rastiyek heye! Pêxember û zanayê mezin zerdeşti li Kurdistanâ Rojhilat ku niha di bin destê Iranê de ye, li kélé-

ka Gola Ormiyeyê li Sablaxê hatiye dinyayê. Hemû pêxember û zanayê di pey wî de hatine ji felsefeya wî ya fireh zanîna xwe girtine.

Di felsefeya Zerdeş de çar (4) xalên bingehîn hene: Ax, av, ar, ba. Jiyan nikare bêyî van her çar mercen bingehîn hebe.

Kesê ku xwe zerdeşti dibîne divê axê biparêze ji ber ku, mirov ji axê çêdibe. Kesê ke axê neparêze ew ne zerdeşti ye. Her wiha divê "ar", "av", û "ba" ji werin parastin.

Belê, dijmin ji ber qelsbûna yekîtiye me, Kurd bi Kurdistan daye kuştin. Nav li beşekê bûye misilman, li beşekê bûye êzîdî, li beşekê bûye xiristiyan. Her beşekê bi gelek beşan perçê kiriye. Niha ji ev politika ji hêla dijmin ve li Kurdistanê têye meşandin. Bêguman hişyarbûna gel weke berê rê nadî dijmin bigihêje armanca xwe.

Li ser Kurdistanê dijmin hakim bûye. Li her derê otorîye wê hebûye. Riya pêşketinê li pêşîya kesen nemisilman girtiye û pêşveçûn û zanîn li wan qedexe kiriye. Cudabûna ku niha di navbera Kurdistanê êzîdî û misilman de diyar dibe, ji ber vê ye.

Êzîdîkî, Êzîdîstan tune ne. Kurdi û Kurdistan hene. Bila em di agirê dijmin de neşewitin û careke din pişta xwe li hemberî neyaran xûz nekin.

Kesen ku gotinê wiha "Em dijminê Kurd in" dibêjin, ew peyayên dijmin in. Neyarên gelê xwe ne.

Tenê riyek heye me rizgar dike. Riya diçe Kurdistanê. Ew rê dîn, kultur, ziman û hebûna me diparêze. Emê ola zerdeşti biparêzin. Ji ber ku di parastina ola zerdeşti de Kurdayeti tê parastin.. Û di nimêja xwe ya Rojhilatê de oldarên êzîdiyan wiha duayan dikin. "Ya rebî! Bi xatirê navê xwe bike, halê Kurdistanê û êzîdiyên Rojhilat û Rojava biparêzel!"

# Ji bo Gazze û Erîxeyê otonomî



Arafat vê otonomyê wek pêşketineke dîrokî dinirxîne

**Nûçeyên Derve**-Hevdîtinên Îsrailê u Filistîniyan gihîste serpîka lihevkirinê, planek ji bo otonomiya heremên Gazze-Erîxe'ye li ber imzekerinê ye. Lî vê planê gelek nakokî xistin navbera partiyen R.R.F (Rêxistina Rizgarî ya Filistinê)

Tê gotin ku Serokê R.R. F'ye Arafat dê vê planê, li Washington bi Wezîrê Karêñ Derveyi ye Îsrailê Şimon Perez re imzeye bike. Çavkaniyeke Îsrailîyan

li Washingtonê got ku ev plan êdî bi giştî hatiye amade kirin û tenê li benda imze kirinê ye.

Serokê R.R.F'ê Yaser Arafat bi vê yekê kefxweş e, û vê planê wek pêşketineke dîrokî dinirxîne, lê ji rêxistinê Filistîni gelek (yêñ di nav R.R.F'ê de ji tê de) li hember vê planê derdi-kevin û berpêyînên (reaksiyon) tund nîşan dan. Serokê hinek rexistinan daxuyandin ku, ev plan dê agirê intifadayê (serhil-dan) vemirîne, ji ber ku ew herêm navenda intifadayê ne. Serokê Eniya Gel ji bo Rizgarîya Filistîni George Habbas wiha got: "Em dê bi hemû hêza xwe li hemberî vê planê rabin. Ev birîna 3 milyon Filistîniyan derman nake."

Hinek kes ji dibêjin ku, ev plan dê bibe sedema şerê hun-dirin. Ji ber ku karê ewlekariye dikeve destê polisên Filistîni û kesên livbaziyan bikin dê "li hemberî xwe wan bibînin."

**LI GOR NÛÇEYÊN  
AJANSA  
ASSOCIATED PRESS**

Li hember derketina gelek Filistîniyan ne tenê ji bo vê se-demê ye. Sedem gelek in, yek ji

wan ev e ku gelek Fîistîniyên penaber ji derveyî wan herêmanin. Derêñ weke Caffa, Hayfa, Bîrseba hwd.

İhsan Şihadeh mirovki 65 salî wiha gazarîn xwe ji Arafat dikir. "Ev nifteya mala min e. Dema di 1949'an de min ji

Hayfayê koçkir, min bi xwe re nifteya xwe anî. De ka bibêje Arafat kare min bizivirine wê derê." Ne tenê kesen ji derveyî wan herêman, lê kesen ji wan herêman jî qîma xwe bi vê planê naynin û naxwazin vege-rin. Hinek kes ji dixwazin şan-


sekî bidin û bibînin ku çawa wê bimeše.

Li aliyê din gelek kesen kev-neperest û nîjadperesten Îsrailîyan ji li dijî vê planê derdi-kevin. Ev kes bi protestoyan reaksiyo-neke tûj nîşan didin û vê planê wek tawîzekê dinirxînin.




Lê ev xort wek wî nafikire. Otonomyê wek tefandina agirê intifadayê dibîne.

## Gelê Azerî Elçîbey nexwest



Ebulfeyz Elçîbey



Haydar Aliyev

**Nûçeyên Derve**-Roja 31'ê Tebaxê li Azerbaycanê ji bo ku pirsgirêka serokomariyê çareser bikin ji 4.09 milyon hilbijeran 3.7 milyon hilbijer cûn ser sindoqê.

Gelê Azerbaycanê ji sedî 90 bi şûnve zivirîna Ebulfeyz Elçîbey nexwest.

Ji lew re ev hilbijartin ji bo Aliyev bû serkeftinek. Li ser hilbijartinê Sekreterê Dewleta Azeriyan Lala Gadzhreva wiha got: "Di ser raya gel re tu ray nîn e, heke gel vegerîna Elçîbey nexwaze, tiştekî ku bê kinamîne."

Di demeke nêzîk de dê encama hilbijartinê ya fermî bê weşandin û li parlamentoyê bê pejirandin Pişt re ji li ser hilbijartina Serokkomarekî nû û tesbîtkirina mêtüyê, dê guftûgo çebibin.

Li aliyê din Azerî li hemberi Ermeniyan her ku dihere têk diçin. Erîşen Ermeniyan a li ser navçeya Kubatli bi ser dikeve.

Li gor vegetina Wezîrê Parêziyê yê Azerbaycanê, 18 gundên doraliyê Kubatli niha di bin kontrola Ermeniyan de ye.

## Li Brezîlyayê qirkirina polisan

**Nûçeyên Derve**-Li bajare Río de Janeiro şeva 29'ê Tebaxê, 21 kes bi çekên gîran êris birin ser navçeya kolitan bi navê xwe Vigaro Geral, Ji bo tolhildana polisekî ku rojekê berê hatibû kuştin.

Kesen ku bûyer ditibûn gotin ku ew kes bi çar erebeyan hatine qada (palaza) Rio de Janeiro ku polis lê hatibû kuştin û, dest bi berikreşandinê kiri-ne. Zarokekî got: "Ew kes çawa ji erebeyan daketine bi hovîti berik reşandine her aliyi. Dîsa eynî zarokî wiha domand: "Jin û mîrên li meyxaneyê bi destpêkîrina êris, ji hev belav bûn û panîk derket. Eriskaran di wê navberê de rîwiyeke kuştin. Pişti vê yekê êriskar ji bûn sê beş. "Pişti êris ji malekê 3 kes (jineke duca-nî û dê û bavêñ wê) bi avêtina naricokekê û reşandina berikan li meyxaneyekê ji 7 kes mirin.

Waliyê Rio de Janeiro li ser vê yekê wiha axivî. Şik nîn e ku ev bûyer wek heyfîlanîna polisê kuşti pêk hatiye.

"Hiquvanen ku li ser bûyerê vekolîn çekirin ji dan xuyan ku bûyer wek operasyona Polisan çêbûye, pêşî lampe bi agirê çekan tefandine û têlên telefona birîne pişt re dest bi qirkirinê kirine.

Pişti bûyerê, sibehê gel bi keviran êris bir ser erebeyen polisan û ew protesto kirin. Nehîştin polis û itfayê bîn cendekan berhev bikin.

Polisan, penc hefte berî vê



Gel pişti qirkirinê bi keviran li hemberî polisan rabûn û nehîştin polis têkvin nava navçeyê

bûyerê ji, 8 zorakên bêxwedî ku li nik dêrê razabûn kuştin. Ji xwe polisên leşkerî yên Brezîlyayê bi kuştina zarokên bêxwedî bi nav û deng in.

Li cihê bûyerê gel hîn bi xof û tirs e û naxwazin rojnameger û televizyonwan bi tenê bihelin. Li ser ferma Serokê Brezîlyayê Hamar Franco, Wezîrê Dadmendiyê (edaletê) cû cihê bûyerê.

*Aydin Menderes:*

# 'Divê partiyêñ cudaxwaz jî hebin'



Serokê Partiya Guherîna Mezin  
Aydin Menderes

**Navenda Nuçeyan-** Serokê

Partiya Guherîna Mezin Aydin Menderes roja 1'ê Îlonê got: "Divê partiyêñ cudaxwaz jî li qada politikaya legal (zagonî) cih bigirin."

Menderes daxuyand ku, ew jî yekitiya Tirkîyeyê û yekparetiya erdê wê dixwaze, lê qedexekirina partiyêñ cudaxwaz tu pirsan çareser nake.

Menderes di hevpeyîneke ku bi rojnemeya 'Daily News' re kiribû de wiha dibêje: 'Em pirsgirêka Kurdî di çarçoveya demokratikkirina Tirkîyeyê de

difikirin".

Di eynî hevpeyînê de li ser mesela ziman jî wiha got: "Li Tirkîyeyê mirov divê karibe rojnameyan bi zimanekî xeynî Tirkî derxîne û weşanên radyo û televîzyonan jî bike. Li nik vê, divê TRT (Radyo, Televîzyona Tirkîyeyê) jî weşanên bi zimanen xeynî Tirkî bikin. Ne tenê Kurdî bi hemû zimanen kesen din ku bi zimanekî din diaxifin". Aydin Menderes dîsa diyar kir ku dewletê jî bo cere-serkirina meseleya Kurdî tim êrîş biriye ser mirovên bête-

wan (bêsûc), ne kesen ku problem derdixînî.

Serokê PGM'ê li ser politika xwe der heqê pirsgirêka Kurdan de ev nirxandin kir. "Çare-serkirina pirsgirêka Kurdan bi livbaziyan PKK'ê ve ne girêdayî ye û li ser meseleye lihevki-rin divê."

Menderes der heqê bi PGM'ê re li hevrûniştinê jî bo li hev kîrinê de jî got ku, tiştê bingehîn li ser masê rûniştin nîn e û berî her tiştî demokrasi divê. Tiştîn wek li ser maseyê rûniştin karê taktîkan e, li aliyê

din mûhababê wan ne bi tenê tek mirov, lê neteweya Kurd e.

Menderes li ser meseleya hêzîn derveyî jî wiha axivî: "Problem di nava welat de ye, ne li derve ye. Heke 60 milyon mirov lihevhatinê çêbiye, dewleten cînar (Iran, Suriye, Iraq) nikarin tekiliyê me bipelişinîn.

Li ser ihtîmala hevkariya PGM'ê û Partiya Demokrasiye jî got ku, ew nikare li ser vê meseleye tiştîkî bibêje, ji ber ku, tiştîkî wisa hîn di rojê de nîn e.

Banga Platforma Aştiyê ya Îzmîrê:

## 'Li dijî şer aştiyê biparêzin'

**Navenda Nuçeyan-** Bi rasthatina 1'ê Îlonê, Roja Aştiyâ Cihanê, Platforma Aştiyê ya Îzmîrê daxuyaniyek wêsand. Di vê daxuyaniyê de, platform bangî hemû kesen li dijî xwînrijandinê ne dike ku li hember şerê qirêjî yê bi giştî derkevin û aştiyê biparêzin.

Daxuyanî bi van gotinan dest pê dike: "Kî ci dibêje bila bîbêje, iro şerekî qirêj bi hemû aliyen xwe yên hov ve didome. Ev heftê sal in ku, hebûna Kurdan tê înkarkirin û bi ażîneyen (metod) leşkerî ev pirsgirêk nehatine çareserkirin. Lazim e êdi dewleta Tirk dev ji gotinê wek "dijminê derve",

"tahrîkên derve" û "perçebûna welêt" berde. Ev gotin giş mazeretên bêkok in.

Li Solingenê dema Tirk hâtîn şewitandin, hemû Almanan reaksiyon nîşan dan û ev bûyer protesto kîrin. Lî li ser axa me li hember bûyerên xerabtir zehfîn me dengê xwe dernexistin û li van kîrinên li dijî mirovahîyê temaşe kîrin".

Platforma Aştiyê di daxuyaniya xwe de bi van gotinê jîrîn, ji bo lihevhatinê bangî aliyen şer kîr: "Lazim e aliyen ku şer dikin şerrawestinê ilan bikin û dest bi hevdîtinê siyasi bikin. Divê Rêveberiya Taybetî û pergala cerdevaniyê ji

holê rabin. Divê gund neyên şewitandin û valakîrin". Platforma daxwaza hilarîna her cu-re pêkutiyen li dijî mirovahîyê kir û mafê tayînkirina çarenûsiya neteweyen bindest parast.

Di nava Platforma Aştiyê ya Îzmîrê de, saziyên ku cih digirin ev in: KMM'ya Îzmîrê, Halk Evlerî herêma 5., Komeleya Kesen Li Dijî Cengê ya Îzmîrê, Eğit-Sen'a Îzmîrê, Komeleya Hafîzîn Hemdem, Tarim-Sen, Komeleya Hiqûqzanen Hemdem, Tüm Bel-Sen şaxê 2., Komeleya Demokratik a Çanda Gel, Tüm Madan-Sen, Tüm Yargi-Sen

sendikayê karkeran 702 caran biryara derketina grevî girtine, lê tenê 98 derketine grevî. Di eynî demê de 232 kardar biryara lokavtê dane, lê tenê 11 lokavtê çêbûnê.

Li vê daxuyanê de dîsa tê gotin ku, bi giştî hejmara rojê windabûyî digihîje 1.3 milyon, hejmara mirovîn bandora grev û lokavtan lê bûye, digihîje 69.473 kesan

sendikayê karkeran 702 caran biryara derketina grevî girtine, lê tenê 98 derketine grevî. Di eynî demê de 232 kardar biryara lokavtê dane, lê tenê 11 lokavtê çêbûnê.

Li gor reqemên (hejmara) Wezerata Xebatê, di sala 1991'an de 4.9 milyon roj winda bûbûn. Di wê salê de hejmara grev 389 hejmara lokavtan 25 bûne. 162.986 karker derketibûn grevî û ji bo lokavtê jî, 60.936 karker demekê bêkar mabûn.

## Greva Gündem'ê ya birçîbûnê didome

**Navenda Nuçeyan-** Ji bo pest û pêkutiyen li ser rojnameya Gündem'ê bênen hilanîn û nûçevana Gündemê Aysel Malkaç serbest bê berdan, greva birçîbûnê ya xabatkarênen rojnameyê, bi piştgiriya hêz û kesen demokrat û şoreşer ve didome.

Roja pêncsemê (2 îlon 1993) ji xebatkarênen rojnameyê Zülküf Kişanak, Ayşe Palay û Ayten Akgüner nobedariya grevî dêr standin.

Ji bo piştgiriye jî nivîskarê rojnameyê Doç. Yalçın Küçük kete grevî. Doç. Küçük berî ku têkeve grevî wiha got: "Ev reaksiyon (berpêyi) me ya li dijî hovîti û bêbextiyê ye. Ji bo min ev grev ne bi tenê parvekirina hestêne hevpar e. Li nik vê ahengeke pîroz, ji bo Ferhat û Ayselê ye". Ji gelek hêz û kesen şoreşer û



Greva birçîbûnê ya rojnameya Gündemê bi beşdarî û piştgiriya gelek welatparêz, nivîskar û huner-mendîn rewşenbîr ve didome.

welatparêz, ji bo grevî destek tê. Hin kes bi serdanen xwe, wek İsmet Şerif Wanli (Dirok-

zan- Kurdîzan- Hiqûqzan), Feqî Huseyîn Sağnîc (Ziman-zan), İbrahim Gürbüz (Serokê

NCM'ê), hînek kes bi stranen xwe, mîna Koma Azad, hînek ji bi mesajen xwe, mîna Sirri

Sakik, Burhan Karadeniz, Navenda Giştî ya Eğit-Sen'ê, OKM, kovara Newroz Atesi, xebatkarênen rojnameya Azadî, Sağlık-Sen û hwd, hînek din jî bi besdarbûna grevî ve, mîna Dilen Şoreşer ji girtîgeha Gebze, li ser navê welatparêzen Dêrikê Serhan İpek, Niyazi Taş, Mürüvet Cacim, ji xebatkarênen OKM'ê Ufuk Ülker, Recep Yürekduz, Ebû Akat, Eylem Erkek, İlkkay Çal, li ser navê welatparêzen ji İkitelliye Latif Polat, Cemal Güler, ji rojnameya Emeğin Bayrağı Hayri Argar, li ser navê Komîsyona Ciwanan a DEP'a Güngörenê Orhan Özen, welatparêzen li Stenbolê Beyhan Akbal, Devrim Akbal, Metîn Beyret û bi dehan mirovî şoreşer û welatparêz, piştgiri didin vê protostoyê.

*Bi jineke Kurd a hunermend ku li Ewrûpayê dijî re hevpeyvîn:*

# ‘Li Ewrûpayê jin wek alet û karton dimîne’

● “Kultura me tiştek e, kultura Ewrûpiyan tiştekî din e. Lê gelekî tiş di kultura me de hene ku li ba min ne baş in. Pirr tiş jî di kultura wan de hene ku baş in. Mînak, wek mesela jin di kultura me de hene ku mîr li jinê zilm dike. Ez gelekî xorten Kurd li Ewrûpayê nas dikim ku bi keçen Ewrûpi re zewicîne. Ew di mal de alîkariya jinê xwe yê Ewrûpi dikin. Jinê wan ci bibêjin ew guhdariya wan dikin. Lê ji bo jinê Kurd ne wiha ye.”

Xwişka Merziya tu dikarî ji kerema xwe re, xwe bi me bidî nasîn?

- Ez di sala 1958'an de li Kurdistana Rojhilat, li bajarê Merîvanê ji dayîk bûm. Pişti xwendina lîseyê, ez bûm mamosteyê zarokan. Pişti ku Şah ket û Humeynî hat, ez ji kar hatim avêtin. Wê demê keça min a mein yek salî bû. Kurê min Mardîn jî, di zikê min de bû. Bi wî awayî ez ketim girtîgehê. Dema ez ji girtîgehê derketim, bi mîrê xwe re ez ji çûm nav pêşmergeyan. Li wir min çend stranê şoreşgerî di Radyoyâ Şoreşê de belav kir. Pişti çend sal pêşmergetî, em mecbûr man ku, derkevin derî welat.

Ci hengê û çîma te welatê xwe terk kir?

- Di zivistana 1984'an de me Kurdistanê bi cih hişt û em hatin derî welat. Me berê, Kurdistana Rojhilat hişt û em derketin serê çiyan. Ji ber ku azadî û demokrasî ji bo Kurdan nemabû. A duyemîn jî, me ji bo mafêndi Kurd xebat dikir. Sedem ci bû ku me çiyan berdan û em hatin derî welat? Sedem ew bû ku, me dest ji şoreşê berneda. Lê, mixabin hunerî ji me re tune bû. Her tim li ser me bombebaran bû. Lazim bû ku, me her tim koç bikira. Ez weke jinekê mecbûr mam zarokan xwedî bikim. Alîkariya Nasir bikim. Ü pêşmerge ji bim. Ji bo Nasir jî xebata hunerî ji gelekî dijwar bû. Îmkan fenî û teknîkî tune bû. Me bi hevdu re biryar girt ku, em derkevin derî welat û li wir karê xwe bimeşînin.

Dema tu li welat bûy, di fikra te de Ewrûpa çawa

bû?

- Berî ku ez ji welat derbikevim, qet ez nedifirkirîm ku rojekê em dê derkevin Ewrûpayê. Min bihîstibû ku li Ewrûpayê azadî û demokrasî heye. Bi taybetî li Swêdê.

Tu xwe li Ewrûpayê çawa dibîni?

- Ji aliyekeji ve ez gelekî kîfxweş im ku, ez li vir im. Lê, li aliye din jî ez ne kîfxweş im. Yekemîn ji gel û axa xwe dûr im. Duyemîn, mesela kulturî ye. Kultura me tiştek e, kultura Ewrûpiyan tiştekî din e. Lê ge-

Jinê wan ci bibêjin ew guhdariya wan dikin. Lê ji bo jinê Kurd ne wiha ye. Dema jin Kurd be, bi ser de zilm jî lê dikin. Pişti çend sal gava ku şiyar dibin, dibînin ku di navbera wan de ferqa kulturî heye. Ew vê carê diçin bi jineke Kurd re dizewicin. Heger jina Kurd iîtiaz bike, dibêjin: “Ew Ewrûpi ye û tu jî Kurd i. Kultura me yek e, tu mecbûr qebûl bikî.” Dîsa mîna ew mafê inسانî ku mîr li jina xwe qedexe dike ku jin nikare dîtin û pêşniyarên xwe bibêje. Mîrê xwe bi xwe hilbijere û hwd.

Ji bo te êş û taliyên Ewrûpayê ci ne?

- Li Ewrûpayê jin, weke alet û karton dimîne. Li wir zilm li ser jinan gelek e. Heta ji Kurdistanê ji paşve maye. Li vir jin divê hem kar bike, hem zarok xwedî bike û hem jî xizmeta mîr bike. Jin, her roj 10 saet ji mala xwe dûr e. Kar dike.



Hunermend Merziya Rezai

rin.

Tu jinê Ewrûpi çawa dibîni?

- Ji aliyekeji ve azadî heye ku ew mafêndi xwe biparêzin. Lê disa mixabin ku ez ji tiştekî pirr aciz im, ew jî dev ji hevberdayîna jin û mîrên Ewrûpa ne. Li Ewrûpayê % 90 jin û mer hevdu berdin. Sedem ew e ku, jin ne xwedî mafê xwe yî heqîqî ye. Ji ber ku mafê wan ji a-

riyê dîsa ji bo rizgariya ax û netewaya xwe di nav têkoşînê de cih girtiye. Lê, jina Kurd ji bo mafê xwe xebat nekiriye. Ez bawer im ku, jin dê dest bidine hevdu û ji bo mafê xwe xebatê bikin. Zilm û zora civaka mîran ji ser xwe rakin.

Wek ku em pê dizanîn, tu hunermendeke Kurd i. Gelo heta iro ci berhemên te derketine, tu dikarî ji me re bibêj i?

- Heta niha qaseteke min derketiye. Lê, hezar mixabin ji ber sedemîn aborî û civakî îmkanen min çenebûn ku, ez zêde li ser müzika Kurdi bixebitim. Lê kîfxweşîyeke ku, dê qaseta min a duyemîn di nêzîk de derkeve

Gelo daxwaz û mesajên te ji bo gelê Kurd û rojnameya Welat hene?

- Gelekî kîfxweş im ku di rojnameya Welat de li ser problemen jinan gotübêj û hevpeyvîn tê çekirin. Ji aliye din ve ku rojnameya Welat bi Kurdi tê nivîsandin û belavkirin. Ez hêvîdar im ku, rojnameya Welat jiyana xwe bidomîne û ew bibe ronahiye. Ji bo gelê me, rînîşan bide. Ez daxwazim di rojnameya Welat de, rûpelike taybetî ji bo pirs û problemen jinan bê amadekirin. Daxwaza min ew e ku, hemû Kurd li dijî dagirkeran bibin yek. Têkoşînê xurttir bikin.

Serketina hemû xebatkarê rojnameya Welat dixwazim.

**Hevpeyvîn:  
Berîvanê Dêrsimî**



Merziya Rezai di sehneyê de bi şûyê xwe Nasir Rezai (ê bi şal û şapik) re.

leki tiş di kultura me de hene ku li ba min ne baş in. Pirr tiş jî di kultura wan de hene ku baş in. Mînak, wek mesela jin di kultura me de hene ku mîr li jinê zilm dike. Ez gelekî xorten Kurd li Ewrûpayê nas dikim ku bi keçen Ewrûpi re zewicîne. Ew di mal de alîkariya jinê xwe yê Ewrûpi dikin.

Gava ew vedigere malê, lazim e ku ew karê malê jî bîke. Lê, li Kurdistanê, jin li malê rûdine. Zarok xwedî dike. Xwarin çedîke, kîncan dişo û mîrê xwe xwedî dike. Mebesta min ne ew e ku, Kurdistan ji Ewrûpayê baştır e. Hem li Kurdistanê, hem li Ewrûpayê û hem jî li her derê zilm li jinan tê ki-

liyê sermayedaran ve hatiye xwarin.

Tu rola jina Kurd ji bo rizgarkirina welat çawa dibîni?

- Rola jina Kurd iro ne weke ya berê ye. Jin niha bêhtir ketiye nav xebata şoreşa Kurdistanê. Bi mîran re di nav têkoşînê de ye. Jina Kurd bi vê zilm û zorda-



Tenê yên mirî û yên kêmaqil fikrên xwe naguherînin.

LOWELL

# Puf biki û vinandê mi

## (Dimilki)

Aşmana aşma temûz a. Roje dest bide kerdo. German ver a kê hêliyêne. Yew kalo, ceniya xwi û yew tornê xwi benê. Namê enê torndê kaloy. Heso yo. Eno kalo sey heme misilmanan, o zî roje gêno. Teqîbe-na temenê (emrê) kaloy hewtay serreyda xwi. Bi zanayışê şima tiriyakiye cixara wo. Vist û çeher se'eti nan û awk nêwero derê qe, lakin di se'eti ki cixara nêan-co xînt (delû) beno.

Sihoran di her azan weynadişê me-lay di eno kalo nan werdişî zafer, cixaşa anceno. Roje biyo pancês (15). Kalo aw roj coserra wardeno şono hêgadê xwi di xebitiyeno. Ki beno nizdiye taştarî karê xwi hêga di caverdano yeno keye. Roj hêdîna ver bi hetê eñ ya tadiyawo. Cixara kaloy vîri keweno. Kalo seken nêkeno nêşeno kermê cixara xwi ra dûrî fino. Wede (ode) di ca bide nêkuweno. Warzeno xwi ser ge eno pola, ge aw pola wede di şona û yeno. Ray ravan desetê xwi fineno quşida tutûndê xwi ki rojê xwi bişikna, rana fek tira verdano. Xwibi xwi qâlîkeno vano; ez bi ena erdişa xwi na sîpî, senî go rojê xwi bişikna. Fek roje şikiştişî ra

verdano. Welhasil xwi yew rayîd veyneno.

Destê xwi fineno tunik (cêb) xwi, qutiya xwi, xwi tonik ra vejeno. Yew qalindî pêşeno. Veynda tordê xwi dano ano xwi het. Cixara torndê xwi fêka nano. Çeqmakê xwi, xwi tonik ra vejeno û derê panano. Kalo torndê xwi ra, vano:

wedi biyo zey gomî. Dû ra kê nêşenê dekuwî zere. Cenêk mérdedê xwi ra, vano:

– Ma'rûm! Eno ci halê to yo. Ti bi ena erdîşa xwi na sîpî şerm nêkenê to rojê xwi şikito? Kalo, vano:

– Nê, mi rojê xwi nêşikito. Ceniya jê vano ki to nişikito, le eno ci dûyê cixara wa kewto zere. Wede pirr bîyo. Kalo, vano:

Hesoy cixara şimita. Ceniya jê, vano:

– Heso ci, cixara antiş ci. Heso hema şes serre wo. Kalo, vano:

– Mi derê cixara piş, adir pana ûmi va banci û dû vere fek vinandê mi di. Ceniya jê vano:

– Ma rûm la rojê nîşikîyeno. Kalo, vano:

– Cay mi cixara şimita ki rojê mi bîşikiyo. Ceniya jê vano:

– Lajikî du puf kerdo fek û vinendê to. Dû fek vînandê to ro şyo zeredê to. Senî rojê to nêşikîyeno. Wule rojê to şiqiyawo. Kalo cenîda xwi ro hêrs beno, vano:

– Ez vano mi cixara nêşimita, a vana rojê ta şiqiyawo. Rew teber, keyna xîntî. Ti bi gibê mi zana.

Mihem Himbelij



– Banci û dû püflî fek û vînan (pirnikan) dê bawkal dê xwe, fek û vînandê bawkaldê xwi. Tornê jê gupanê xwi pirê keno û ber bi fek û vînandê bawkaldê xwi dano. Kermê kaloy biney (tikêkê) şikiyeno. Eno nabêni di ceniya kaloy kuweno zeredê wedi. Senî ku kuwena zere, bavo! Ki ci veyno. Ki zerê

# TÎR

Musa Anter



## Ey Şehîd Mûsa Anter

Tu hozan î, tu seyda yî, mezin î. Te di kitêbên xwe de rastî, dirustî, merdî, şeref, hisyet, namûs û serfiraziye neqîşand. Te riya azadiyê nişanî me da. Te li hember zilm û zoriyê û barbariyê têkoşîn da. Te emrê xwe di têkoşîna azadiya Kurdan, rîgariya Kurdistanê de borand. Tu ne carekî şehîd î, tu ne yek şehîd î. Te çend car navê Kurdan anîbe ziman ewqas şehîd î. Belkî te çend milyon car behsa Kurdan kiriye, tu ewqas milyon car şehîd î. Lewre tu seba me hatî şehîdkirin.

Te evîn û nevînê bi me da eşkerekirin. Me evîn û nevîna xwe ji te nas kir. Tu kelemê çavê neyaran î. Tu benda li pêşiya neyaran î. Neyar ji qelem û kaxezêن te xof digirtin, ji nivîsên te dibizdiyan. Evîndarênen te jî, li hêviya nivîsên te diman. Her roj, me diviya ku, nivîseke te di rojnameyan de derkevin da ku, em bixwînîn. Wexta me nivîsên te dixwend, em pê mezin dibûn,

**Te evîn û nevînê bi me da eşkerekirin. Me evîn û nevîna xwe ji te nas kir. Tu kelemê çavê neyaran î. Tu benda li pêşiya neyaran î. Neyar ji qelem û kaxezên te xof digirtin, ji nivîsên te dibizdiyan. Evîndarênen te jî, li hêviya nivîsên te diman. Her roj, me diviya ku, nivîseke te di rojnameyan de derkevin da ku, em bixwînîn. Wexta me nivîsên te dixwend, em pê mezin dibûn,**

**me kêfxweşî û lezet didît.** Tu jî şehîd ketî. Dê têkoşîna te, bi pênûsên sedan nivîskarî ve bidome. Xelk bi te re ye, em te bi tenê nahêlin. Di vê têkoşînê de

Xwedê alîkarê me ye. "Xwedê ji me re bes e, ew

ci wekilekî sipehî ye" (Ali İmran-173).

Em hemû Kurd deyndarênen te ne. Ez û hevalên xwe silavkarênen te ne.

Xwedayê Alî (c.c), di Qurana pîroz de wiha gotiye: "En ku di riya Xwedê de têne kuştin, wan mirî hesab nekin, şehîd namirin, sax in" (Ali İmran-160). Riya Xwedê, heq, edalet û azadî ye. Dema Xwedê milet û zimanê dînyayê çêkir, bi wan re miletê Kurd û zimanê wê jî çêkir. Di İslamiyetê de înkariya heq û heqîqetê, kufr e, munafîqî ye. Kurd miletê misilman e. Azadiya miletê Kurd, wek miletê dînyayê heq e. Seydayê Mûsa Anter li heqiyê xwedî derket, li hember înkarker û munafîqan bi qelema xwe têkoşîn da. Ji ber ku, li ser riya heqiyê bû jî, munafîqan ew şehîd kiri. Xwedê, Seydayê Şehîd Mûsa bi cenevê şâ bike û dîtina cemala xwe nesîb bike û müşeref bibe. Amin

Ey Mûsa Anter! Xwedê, xwînxwaran û munafîqan, qatilên te, bi navê xwe yî Qehar, qehr bike.

Qatilên canê te qehr bibin bimirin. En ku neyartiya doza te dikin qehr bibin. Qehr bibin bimrin ên ku neyartiya miletê te dikin.

## Jûjî...

## Doğan Güzel



# Têkoşina Neteweyî ya Kurd polîtikaya cîhanê diguherîne

Welatên dinyayê, hêdî hêdî ber bi naskirina mafdariya têkoşîna rizgariya Kurd û rîberê vê têkoşînê ve têr. Ev ji demekê ve ye ku, rayedarê dewlet û saziyên navneteweyî bi PKK'ê re rûdinin û dîtinê wê distînin. Di van hevdîtinê ku, bi nûnerên ERNK'ê re pêk têne de, pirsgirêka Kurdi bi a-wayekî fireh tê guftûgokirin. Gelek rayedar û nûnerên

rêxistin û dewletan, piştgiriya xwe ya bi têkoşîna Kurdi re pêşkêş dîkin û yêr din jî, xwe mecbûr dibînin ku dîtinê PKK'ê bigirin.

Li gor agahiyênu ku, berpirsiyaren ERNK'ê yê Ewrûpayê, bi nûnerên NATO'ye re jî hevdîtinek pêk anî û diyar kir ku, dê hikûmeta Rusyayê jî bo ku çek difiroşe Tirkîyê û ev çek li hemberî gelê Kurd têne bikaranîn, protesto bikin. Serokê Partiya Karkeren Sosyalist ê Estonia Maty Lucas jî mesajek ji ERNK'ê re şand û piştgiriya xwe ji bo têkoşîna Kurdi pêşkêş kir. Maty Lucas, ji bo hevdîtinek jî daxwaza xwe anî ziman.

her demî zêdetir bûne û ji gelek hêlan jî daxwaza hevdîtinan têne kirin.

Berpirsiyariya ERNK'ê ya Ewrûpayê, bi nûnerên NATO'ye re jî hevdîtinek pêk anî. Di hevdîtina bi nûnerên NATO'ye re de, li ser çekên kîmyewî ku dewleta Tirk di şerê bi PKK re de bi kar tîne hate rawestin. Ji Wezareta Derveyî yê Belçikayê Marcy Glyn jî, bi mebesta 1 İlön Roja Aştiya Dinyayê mesajek bi rî kir û daxwaza hevdîtinek lezgînî (acîl) kir. Li aliyê din Serokê Meclîsa Belçikayê daxuyand ku, dê di meha İlön de ji bo lêkolînê heyetekê bişîne Kurdistanê.

Endamê ANC (Kongreya Neteweyî ya Efrîqayê) Kay Morsamî, nûneriya ERNK'ê zi-yaret kir û li ser navê rêxistina xwe piştgiriya xwe pêşkêş kir. Morsamî di serdana xwe de daxuyand ku, têkoşîna Kurdi têkoşîneke mafdar e û li ser vê mafdariye guftûgo nabe.

Hevdîtinê heyetek ji hikûmeta Swîsreyê (İsvîçre) û ERNK'ê hê jî didomin. Di van hevdîtinan de, li ser helwesta (tewra) Tirkîyê ya li hember pirsgirêka Kurdi tê rawestin. Weki din, li ser bûyerên Bernê jî guftûgo pêk têr.

Berpirsiyare ERNK'ê yê Ewrûpayê, di 27'ê meha Tebaxê de bi heyetek ku ji Berpirsiyare Konseya Hevkâri û Ewlekarî ya Ewrûpayê (KHEE) Pekka Hyuonen, Serokê Heyeta Fînlandiyayê li Konseya Ewrûpayê Tarju Halonen, Nûnerê Mafêni Mirovan û xwendiyê Xelata Aştiyê yê Nobel Prof. Goren Fon Bunstorf û Cigirê Karêni Siyasi yê Wezareta Derveyî yê Fînlandiya pêk dihatin re hevdîtinek pêk anî. Di vê hevdîtinê de, siyaseta Tirkîyê ya der barê pirsgirêka Kurdi de û PKK'ê hatin gengeşikirin. Li gor agahiyênu ku ji hevdîtinê hatine standin, heyetê daxuyandiye ku, divê mafêni Kurdan ên neteweyî û siyasi bêne dayîn. Li gor nîxandinê heyetê, Tirkîyê şerrawestinê jî baş nenîxandiye, li aliyê din PKK, bi vê gava xwe ihsbat kiriye ku aştiyê dixwaze ji ber vê yekê jî, tu hincet nemane ku PKK wek rêxistinêke terorîst bê nîxandin.

En ku me xwe gihande wan û dîtinê wan girt ev in: Nivîskar Doç. Yalçın Küçük, Serokê Partiya Karkeren (IP) Doğu Perînçek, Serokê Enstituya Kurdi Şefîk Beyaz, Berpirsiyare Giştî yê Nûbiharê Sabah Kara û Koordinatörê Weşanê yê Özgür Gündemê Mehmet Oğuz

Doğu Perînçek (Serokê Partiya Karkeren a Tirkîyeyê):

## "SIYASETA NATO'YE AMERİKA TESPİT DIKE"

Siyaseta Dayê (Dewleten Yekbûyi yê Amerîkayê) ya Rojhilata Navîn ew e ku, gelan li ser meseleyen milî bi hev bixe û wan biperitîne. Bi vî rengî DYâ dixwaze meseleyen neteweyî veguherîne kangrenê, da ku ev gel mecbûr bimînîn û xwe bispérin Sazûmana Dinayayê ya Nû.

DYâ daxwaza Tirk bi temamî xistiye bin hîmaya xwe. Vê gavê jî dixwaze bikeve têkiliyê. Armanca wê ew e ku hem daxwaza Tirk, hem jî rêxistinê Kurd bi xwe ve girê bide û wan muhtac û mecbûr xwe bixe.

Li hember emperyalîzma DYâ yê gelên bindest incebi xwestin û têkoşîna ji bo tayîn-kirina çarenûsa xwe dikarin bi ser kevin. Bi wî awayî, dê warê tevgera DYâ yê teng bibe û dê hêza afirandina birati-

## ROJEVA WELÊT

### Hêza Kurd xwe dide qebûlkirin


Bi xurtbûna hêza rizgarîxwaz a gelê Kurd re, welatên dinyayê jî, her diçe zêdetir bi pirsgirêka Kurdi ve mijûl dibin. Tevî hemû hewldanên KT'ê yên di warê diplomatik de, ku dixwazin PKK'ê di qada navneteweyî de tecrît bikin û ji bo vê yekê tawîzîn mezin didin welatên Rojava û Amerîkayê, PKK her diçe di warê dîplomasiyê de zêdetir tê muhatabgirtin û nasîn. Ên ku heta doh digotin "PKK terorîst e", iro bi PKK'ê re rûdinin û der barê çareserkirina pirsgirêka Kurdi de dîtinê wê distînin. Ev nîşana xurtbûna hêza PKK'ê û têkûna politikayen KT'ê ye.

Politikayen KT'ê yên tunekirin û kokbirînê iflas kirine. Welatên dinyayê vê yekê dibînin. Dizanîn ku, doza gelê Kurd bi darê zorê û bi qetîaman çareser nabe. Ji ber vê yekê ye ku, politikayen xwe diguherînin û ji bo politikayen nû, bi PKK'ê re rûdinin, li Kurdistanê xebatên vekolanî dîkin. Ev pêvajoya nû nîşan dide ku, yê di qada navneteweyî de tê tecrîtkirin ne PKK, lê Tirkîyê bi xwe ye.

Îsbata têkûna politikayen Tirkîyeyê, xwe di bêçaretiya Serokkomar Süleyman Demîrel de jî diyar dike. Süleyman Demîrel, bi dosyayeke qalind ku li ser PKK'ê hatiye amadekirin û tê de dixwazin PKK'ê wek rêxistinêke "terorîst" nîşan bidin, serî li hemû welatên têkîdar dide. Tirkîyê ji mîj ve vî karî dike, lê tişte balkêş nameya Demîrel e. Demîrel di nameya xwe de, bi ifadeyeke belengaz û bêçare dibêje: "Ji kerema xwe re piştgîr nedîn PKK'ê..." Li gorî rojnameyên Tirk, ev ifadeyeke nerm a dîplomasiyê ye, lê di rastiyê de Tirkîyê guherîneke mezin di politikayen welatên Rojava de dibîne. Desteka xwe winda dike. Tu tawîzîn ku bide nema ye. Hemû çekên xwe winda kiriye, êdî demegojî û derew jî pere nakin. Lewre rastî tim di tariyê de namînin. An jî, êdî Tirkîyê li Rojhilata Navîn nikare berjewendiyen welatên împeryalîst temsîl bike, ji bo temsilek wiha, ne xwedî hêzeke xurt e. Bi politikayen xwe yê çewt û bi têkoşîna hêza rizgarîxwaz a gelê Kurd, qels ketiye.

Meyla DYâ yê (Dewleten Yekbûyi yê Amerîkayê) û dewleten Rojava diguhere. Xwe mecbûr dibînin ku, hêza gelê Kurd bibînin û pêşkê wê muhatab bigirin. Ev rastiyek e. Weke ku mamoste Yalçın Küçük jî dibêje; "Tiştekî tirsîn e". Lewre ev pêşveçûneke normal e û dema hevdîtinê bi vî rengî hatibûn.

Bi dîtina me, ev destpêka pêvajoyeke nû ye û dê di rojîn pêş de guherînê girîngir pêk werin. Bi vê armancê, me li ser hevdîtinê PKK'ê, welatên Rojava, NATO û Amerîkayê, dîtinê çend politikvan, nîvîskar û rojnamevanan standin. Armanca me, ji dîtinê cihêreg, agahdarkirina xwendevanen me ye. Lewre wisa diyar dibe ku, dê di rojîn pêş de li ser vê mijarê guftûgoyen girîng pêk werin.



Doğu Perînçek


ya gelan, li Rojhilata Navîn çêbibe.

Amerîka, tenê bi kozêñ Berzanî û Telabanî têr nabe. Dixwaze hin kozêñ din jî bi dest bixe. Gotinê Serokatîya PKK'ê yê dawî jî nîşan dan ku, PKK ji bo hevkariya bi DYâ yê re amade ye. Ev jî imkanen nû pêşkêsi DYâ yê dike.

Doç. Yalçın Küçük (Nîvîskar-politikvan):

## "DEMA HEVDÎTINÊ BI VÎ RENGÎ HATIBÛ"

Min ev pêşveçûn, li ser riya



Yaçin Küçük

ve gera ji KMM'ê ya Îskendere, di balefirê de hîn kîrin. Her ku têkoşîn bilind bibe, dê daxwaza hevdîtinêni bi vî rengî ji zêde bibin. PKK'ê, bi têkoşîna xwe, rasteqîna Kurdistanê bi dînyayê daye pejirandin. Serkêsi û serokatiya xwe ya di vî têkoşîne de ji daye qebûlkin. Ev rewseke fiili yê. Di vê rewşa iro de ku, pirsgirêka Kurdi di qonaxeke ev çend gi-ring de ye, daxwaz û pêkhatina hevdîtinêni wiha normal in. Divê ev pêşveçûn ne zêde bêne mezinkîrin û ne ji jê bêtîrsin.

Pêşveçûnen bi vî rengî, di dema şerê rizgarkirina Tirkîyeyê ya 1923 yan de ji pêk hatin. Di wê demê de ji, her ku têkoşîn bi pêş diket û kifş dibû ku dê bi ser keve. ji weleten cur be cur ên dînyayê daxwazê hevdîtinan dihatin kîrin û li Tirkîyeyê xebatêne ve kolanê pêk dihatin. Li ku dera dînyayê dibe bila bibe, biserke-tina têkoşînekê ger xwe diyar bike, hevdîtinêni bi vî rengî sift dibin.

Di vê radeya ku iro têkoşîna PKK'ê xwe gihandiyê de, hevdîtinêni wiha normal in. Li a-liyê din, êdi wextê hevdîtinêni bi vî rengî ji hatibûn. Dê si-behê Welatên Pazara Pişkar ji daxwaza hevdîtinê bikin.

Rewşa stratejik a Rojhilata Navîn, ji bo weleten dînyayê gelek gi-ring e. Ger hevdîtinêni Réxistina Rizgariya Filistînê û Îsrail bi encameke lihevkirinê biqede, dê gi-ringiye pirsgirêka Kurdi zêdetir bibe û dê bigihîje radeyeke bilindtir. Ev tiştekî xwazayî ye û ne tiştekî tirsê ye.


Sabah Kara (Berpîrsiyarê Giştî yê Kovara Nûbihar'ê):

#### "AMERİKA LI DÜ BERJE-WENDIYÊN XWE YE"

Divê em li Rojhilata Navîn politikayêni weleten Rojava û Amerîkayê, li gorî Nîzama Nû ya Dînyayê binixînin. Amerîka dixwaze hemû welet û hezîn Rojhilata Navîn bike bin kontrola xwe. Li gor vê Nîzama Dînyayê ya ku Amerîka li gor menfeetêni xwe afirandiye, pêşî Iraq hate helkirin. Dû re Libya, Sûriye û weleten din.

Nîha ji ji bo tevgera Filistînê nekeve bin kontrola hezîn İslâmî ku nêzî Iranê ne. Yaser Arafat muhatab digirin. Yaser Arafat ji bo wan 'ehwen-i ser e'. Armanc tunekirina hezîn mîna rîexistina Hamas'ê ye. Dû re ji, dê dor bê Iranê. Nîha problema wan a herî mezin Iran e. Lewre li Rojhilata Navîn, Iran bi tenê li hemberi Amerîkayê derdikeve. Ji ber vê yekê ji, bi iştîmaleke mezin, dê êrîşî Iranê bikin.

Nêzîkbûn an dûrbûna weleten Rojava û Amerîkayê bi welet û rîexistinan re di vê çarçoveyê de ye. Têkiliya wan a bi dewleta Federal a Kurdistana



Sabah Kara

na Başûr re ji bi vî rengî ye. Ji ber menfeetêni xwe di wan erdan de ne. Lî em niha nikarin ji bo vê yekê dengê xwe bikin. Lewre dema ew derkevin, li Başûr Kurd di bin talûkeya mirinê de ne. Bi baweriya min ji bo dema kin mirov li gorî şer-tan difikire. Lî di dema dirêj de, têkiliyê bi vî rengî feyde nadîn. Lewre ew li dû menfeetêni xwe ne. Ji ber vê yekê ji, em têkiliyê bi van weletan re, ji bo dema dirêj rast û durist nabînin.

Şefik Beyaz (Serokê Enstî-tuya Kurdi ya li Stenbolê)

#### "EDÎ RASTIYA KURDÎ-TANÊ TÊ NASIN"

Dewleten Ewrûpayê rastiya



Şefik Beyaz

Kurdistanê, roj bi roj baştir nas dîkin û politikayêni xwe li gor mercen nû diguherînin. Weleten Rojava heta niha li gorî Tirkîyeyê politika dimeşandin. Li gor beyanê Tirkîyeyê, bi hêviya têkîna hezîn rizgariye politika tesbit dikirin. Bi taybe-


tî di dema serrawestinê de wi-sa bawer dikirin ku, PKK ji ber qelsbûna hezîn xwe serrawestin ûlan kir. Lî pişti serrawestinê ku, gerîla livbaziyêni bi hezîtir pêk anî û derbeyê xedartir lê da, ev ditinêni wan ji guherîn.

Revandina tûrîstan ji sebebek ji guherîna van politikayan e. Lewre, li ku dibin bila bibin, gerîla tûrîstan dikare birevîne û tevî hemû operasyonêni hezîn dewletê wan li çiyayê Kurdistanê dikare biparêze. Ev ji ji a-liyê welatên Rojava ve bû wek îsbata hezîn PKK'ê. Pişti kifş bû ku, Tirkiye nikare hezîn gerîla qels bike, weleten Rojava û Amerîkayê ji politikayêni xwe ji nû ve ji çav derbas kîrin. Hevdîtinê iro, vê guherîne ifade dikin. Bi baweriya min hinek ji dixwazin PKK'ê nerm bikin. Lî wisa dixuye ku dê ev hevdîtin bidomin û xurttir bibin.

Mehmet Oğuz (Koordinatör weşanê yê Özgür Gündem'ê)

#### "EV TENGASIYA HEZÎN İMPERYALIST E"

PKK'ê, li hember berfireh-bûna tevgera rizgarî ya nete-weyi ku pêşengîya wê dike, xwest berê têkoşîna xwe fireh bike û ji warê leskerî derxe. Ev yeka ku ez dibêjim, salek-du



Mehmet Oğuz

sal berê dest pê kiriye. PKK, li hemberî hewlîn Tirkîyeyê ku dixwaze tevgera Kurdi li qadêni navneteweyî bi "terorist"î bi nav bike, dest bi xebatêne meş-rûbûna xwe kiriye. Ev hewl ne bi tenê bersiva siyaseta Tirkîyeyê ye, her wiha zarûriya armancîn wê ne. Di gel vê yekê divê diplomasî ji, di vê çarçoveyê de bê fikirîn. Dewleten Rojava di demen berê de heta niha ji li hember kîrin û ces-pînen Tirkîyeyê bêdeng diman û alîkariyê ji pê re dikirî, ditin ku meseleya Kurd wiha hel na-be lewma dixwazin ji nû ve dest biavêjin politikayêni xwe.

Dema em têkoşîna PKK'ê û rewşa Rojava di vê çarçoveyê de bidin ber çavêni xwe, trafi-keke gurr a diplomasîye derdi-keve pêşîya me. Ev trafik ji bo têkoşîna Kurd baş e û bi feyde ye. Ev rewşa ne tengasiya gelê Kurd, lê ya hezîn împeryalist nîşanî me dide.

## Nûçeyê Cengê

**27 Tebax 1993:** Bi cerda gerîlayê ARGK'ê ku li ser Qere-qola "Îkîzce" (Şîrnex) pêk anîn, erebeyeke leskerî û panzereke polîsan imha bûn. 2 lesker mirin, 5 birîndar bûn. Wekî din ji gundê Melê ku li ser Şîrnexê ye 2 gundi ji aliyê leskeran ve hatin kuştin.

Li Patnosa Agiriyê, gerîlayan êrîş birin ser şantiya PTT'ê no-tirvan( bekci) kuştin û erebeyen şantiyê şewitandin.

Di cerda ku gerîla li Sarikamîşa Qersê pêk anî de 2 cerdevan hatin kuştin.

Kontrgerîla 4 kes kuştin. Kontrgerîla erebeya ku 4 kes tê de bûn, ji gundê Dêrşewan bi aliyê Hezoyê ve dicûn da ber gulleyan; Izettîn Altûn, Melik Altan, Hüseyîn Bayîk hatin kuştin. Li Farqînê ji 2 kes bi navê Vahit Demîr û Yusuf Karaüzüm hatin kuştin.

**28 Tebax 1993:** Li Bazidê hezîn dewletê bêsebep gundê Siphân dan ber gulleyen. Kuştin û birîndarî çenebûn. Li Batmanê kontrgerîla Hasan Yilmaz kuştin.

Deveren bi navê Mêrgelo, Zeviyasor, Kaniyâceko, Lerd û Engol ku di nav sînorêni Bilisê de ne, bi operasyonêni hezîn leskerî ve hatin bombekirin. Bi vê operasyonê herêmén daristanî şewitîn.

Erebeyen leskerî li dor Nisêbînê ketin kemîna gerîla, 2 lesker mirin, 2 erebe texrib bûn. Gerîla 2 depoyen titûnê ku nêzîki Farqînê bûn, şewitandin. Tekel 50 milyar li zirarê ket.

**29 Tebax 1993:** Di şerê nav gerîla û hezîn dewletê de ku li Elkê (Beytuşbab) ya Şîrnex pêk hat 3 lesker mirin, 2 birîndar bûn û 3 lesker ji dîl hatin girtin.

**30 Tebax 1993:** Hezîn dewletê bi mebesta ku alîkari bi gerîla re tê kîrin, girtin ser gundê Marî ku li ser Misircê ye. 15 kesan xistin bin çav.

Li Bilise navçeya Kiçi, gerîla Midûrê Tekelê Sabri Yildirim kuştin. Pişti vê bûyerê hezîn dewletê ji li wê herêmén operasyonekê pêk anîn.

**31 Tebax 1993:** Gerîla cerdek bir ser Bazidê, avahî û saziyen dewletê da ber gulleyan. Ev êrîş bi roketan pêk hat û avahî xesirin. Hezîn dewletê pişti vê êrîşê bi operasyoneke dorfi-reh berê xwe dan navçeya û bêhedef gulle reşandin.

Li gundê Holo ku li ser navçeya Sasonê ya Batmanê ye gerîla û cerdevan li hev xistin, cerdevanek mir.

Gerîla riya di navbera Nisêbînê û Cizirê de birî, bi vî awayî ew û hezîn dewletê li hev dan; 2 lesker hatin kuştin û panzerek imha bû.

**1 İlön 1993:** Li İdirê û Gihadînê protestoyen kepengda-xistin û qontaxqefaltinê pêk hatin. Ev protesto bi bangâ ERNK'ê ya ji bo bûyeren pîrozbahîyen 15'ê Tebaxê ku li Dîgor û Melazgirê qewimibûn û nêzîki 60 mirov hatibûn kuştin li dar ketin.

3 gerîla bi bernavkêni Nûman, Zinar û Berçem li gundê Xer-bestîl ku li ser navçeya Çinara Amedê ye, di şer de hatin kuştin.

Gerîlayen ARGK'ê li Kemaha Erzînganê avahîyên stasyona trênen şewitandin, tevî şefî stasyonê 3 kesan ji bi xwe re birin.

Li gundê Avadorikê ku li ser Mûşê ye 5 gerîla ketin kemîna cerdevanan û hatin kuştin.

Gerîla riya navbera gundên Bêcîh û Kiror ku li ser navçeya Qilabana Şîrnexê ne girt û 3 saetan nasnameyan kontrol kîrin. Qamyoneke ku ji leskeran re nan dibr vala kîrin.

**2 İlön 1993:** Kontrgerîla li Batmanê endamê Rêveberiya Bajîr a DEP'ê Habîb Kîlîç (38) û li Farqînê ji Serbijîjkê Nêx-wesxaneyê Zekî Tanrikulu kuştin. Tenê di vê meha dawî de kontrgerîla 16 kes kuştin. li herêmén di nav sînorêni Rêvberiya Taybatî de

Gerîla avêt ser navçeya Pûlûr (Ovacik) ku li ser Dêrsimê ye. 5 lesker û serbazek hatin kuştin. Gerîla gule li erebeya polîsan reşand, polisek mir 2 birîndar bûn. Dîsa li Mazrayê (Elezîz) gerîla avahîyên "köy Hîzmetler" şewitand.

Gerîla cerdi ser navçeya Elbakê (Başkale) ku li ser Wanê ye, di nav wan û cerdevanan de şer derket 4 cerdevan birîndar bûn.

Li Gevera Culemêrgê û Berwariya Şîrnexê ji 12 cerdevan ji aliyê gerîlayan ve hatin revandin.

Li navçeya Bîrecîk ku li ser Ruhayê ye gerîlayen ARGK'ê bombe xistin banqayen İş Bankası û Ziraat bankası yê. Bi teqandina bombeyan ev herdû banqa xesareke mezin dîtin.

Hezîn dewletê gundê Dêresor ku li ser Silopî ye bêbehedef dan ber gulleyan.

# PÊNÛS

Amed Tigris



## Niştimanperwerî doz e, ne toz e

**D**îvî mirov her tiştî bi gotin û dîtinê xwe bawer bike û paşê bibêje. Dema dibêje jî, pêwist e ku wan di jiyanê de bi kar bîne. Heger dîtin, gotin û pratik hevdû negirin, wê demê hêjabûna gotin û dîtinê rast namîne. Gotina pêşîyan a "yê mîrân soz e, ne toz e" vê rewş û helwestê baş dide diyar kîrin. Yanî mirov divê xwedî li gotina xwe derbikeve. Gotina ku dike, tiştî ku dibêje bi cih bîne. Xwedî sozê xwe be.

Heger em Kurd iro wekî rîxistin an jî wekî şexis bi tişkî bawer bikin, di wî warî de bîr û baweriyê xwe diyar bikin û di pratikê de jî li dijberê wê hewl bidin û karekî din bikin, wê demê em xwe bi xwe dixapînîn. Wê demê çi dibe, sozê me dibe toz, na?

Hemû hêzên Bakur niha bi hevdû re dest bi xebata damezrandina eniyeke (bereyeke) netewî kirine û di van rojan de wê bigihêne encameke pozitîv. Hema hema hemû hêzên besdarêne vê xebata eniya wiha dinivîsin û dibêjin:

"Pêwist e ku Kurd ji Tirkan re eskeriyê nekin, darbe, li ekonomiya Tirkîyê bixin û bi taybetî tûrîzma Tirkîyê bidin rawestandin an jî wê felc bikin.."

Bi tenê ne ew rîxistinênu ku di nav xwe de xebata eniya netewî dikin, ew kesen niştimanperweren ku bi serê xwe ne jî, xwedî van dîtinan in an jî vê yekê diparêzin. Belê gotin û dîtinê Kurdan ev in, lê pratik çi ye? Weki ku me li jor jî got ya girîng pratik e, ne gotin û dîtin e. Hezar mixabin ku pratik bi tevahî "toz" e. Hem jî wekî rîxistin bi hev ve girêdayî ne, heta berpirsiyar in, ji bo eskeriya Tirkan 30-40 hezar kronen Swêdi didin arteşa Tirk. Bi ser re jî du-sê meh jî diçin Tirkîyê û li wir eskeriya xwe dikin. Pirraniya van kesen wiha bûne hem-welatiyê (vatandaşen) Swêdi jî. Yanî bi pasaporten Swêdi diçin eskeriya Tirkan dikin. Ev helwest û rewş ji bo ev Kurdêne li welatê Ewrûpayê dijin jî derbas dibe. Yanî ne bi tenê Kurdêne li Swêdê ye. Ev yek.

Ya duduyan; meseleya tûrîzma û tûrîstan e. Kurd wekî rîxistin û şexis ji Ewrûpiyan re dibêjin meçine Tirkîyê; lê hinek kes ew bi xwe wekî tûrist diçine Antalya û Marmaris, Bodrum û cihêne Tirkîyê yên din ên tûristîk. Ew kesen wiha qet nebe hette-yekê be jî wekî tûrist jî naçin Kurdistanê dê, bav û mirovên xwe nabinin. Derdê serê derdan ev Kurdistan tûrist nas û dostêne xwe yên Ewrûpi bi xwe re dibin hêla Tirkîyê. Ji wan re mîvanperwe-riyê dikin. Tercümaniyê dikin. Propaganda û teşwîkbûyina çûyîna Tirkîyê dikin.

Ya sisêyan; divê Kurd ambargo deyinin ser malê Tirkîyê. Heta ku jî destêne wan bê nehêlin malen Tirkîyê li Ewrûpa bêne firotin. Lê Kurd ci dikin? Kurd qumaş, çerm, cil û berg û xwarinêne Tirkan tînin li Ewrûpa bi xwe difroşin. Di dikan û marketen xwe de reklam û propaganda malê Tirkîyê dikin.

Ya çaran; Tirk Kurdistanê ji Kurdan vala dikin. Bi plan berê Kurdan didin metropolen Tirkîyê û welatên Ewrûpayê. Gundiyan Kurdishikin, gund û malen wan dişewitînîn. Yen mayî kuştina xwe digirin ber çav û dîsa dev ji gund û axa xwe bernadin. Lê, hinek siyasiyên me li Ewrûpa ci dikin? Şebekeyan çedîkin û bi pereyekî pirr û giran Kurdan dikşînin û ew tînin Ewrûpayê.

Kijan rîxistin û şexis li xwe digire an jî digire ser xwe bila bigre. Lê, ev rasiteyeke berbiçav e. Ji vê yekê re şirove û navdayîn ne pêwist e. Her kes bi xwe dizane. Her kes her kesî nas ûike. Wekî pêşîyan me gotine "Yê mîrân soz e, ne toz e." Ez jî dibêjim ku niştimanperwerî doz e, ne toz e. Barekî giran e û ne wekî listika zarokan e. Ji bo dozê heta em menfeet û rehetiyê xwe yên grûbi, malbatî û şexsî nedîn bin piyên xwe, em tu cari rizgariya netewî nabinin. Em Kurd bi sed salan in ku cezayen wê dikşînin.

# Ji dînan dîntir Pêkenokên me

## Gabar Çiyan

Ji dîna dîntir

## Pêkenokên me

lêkolîn

Cand-Kültür

Pirtûka bi navê Pêkenokên me

**Servîsa Çandê-**Nivîskar û rojnamevan Gabar Çiyan ku xebatên xwe yên nivîskariyê û lêkolîneriyê li Swêdê didomî-

van de jî mînakandan dide. Gabar Çiyan mebesta xwe ya bi vî celebî di nivîsa "Despêk" û de wiha dadixuyîne: "Her pêkeno-

û qalibên peyvan ve baş bi kar anîye û dihêle ku xwendevan bi dîlxweziyeke xurt pirtûkê bixwînîn.

Weşanên ku li derveyî we-

lat derdike-

vin, pirr

bala me di-

kişne ku ji

jiyana we-

lat, ji merc

û rewşa

welat gelek

cîhê ne. Ev

jî rastiyeke

ku, nivîskar

di mijara

ku li serê

bixebite de,

divê ser-

best û azad

be. Divê

dest di

pêşîra wî

de nîn bin.

Lê nivî-

skarê raste-

qîn jî,

pêwist e ku

çav û

g u h ê n

xwe, ji jîn û

keke me piştî tecrûbe û serpêhatiyen bi salan bûne mal û ketine nav jiyan gel. Her yek bi dizi an jî vekirî mesajekê bi xwe re tîne. Di wan de şopên dîrokî û cografik xwe di de xuyanîkirin."

Nivîskar di pirtûkê de ji xwe re 28 mijar peyitandiye (tespit kiriye) û pêkenokan li gorî wan dabasan bi awayekî gelek kurt şirove dike.

Her çiqas nivîskar pirtûka xwe wek lêkolînerî amade kîribi jî, bêhtir xebata wî didûriye xebateke berhevokî. Yanî ji rengê lêkolîn zehf dûr e.

Di warê bikaranîna ziman de jî, ewqas ne serkefti ye. Nivîskar, di dema şirovekirinê de xwe ji biwêjîn (îdyom) Tirkî nefilitandiye. Dîsa xwe ji zimanê devkî yê hêla Mêrdînê, bi taybetî jî herêma Toran dûr nexistiye. Ji aliyê gramerî û rastnivîsê ve jî dîsa xwedî kîmasi ye.

Pirtûk ji kaxezâ bi kalite û ji 60 úpelan pêk hatiye.

**Navnîşana xwestinê:**  
**Çand-Kültür**  
**Box: 3119, 145 03**  
**Norsborg/ Sweden**

rewşa civaka xwe negire, bi ci awayî dibe bila bibe, bi şêweyekê bûyerên li welatê xwe, yên aktuel hilde destê xwe û li ser wan jî biniwîse.

**Navnîşana xwestinê:**  
**Weşanîen Welat**  
**C/O KFH, Box: 4088**  
**141 04**


# Smîrnoff

**Servîsa Çandê-**Smîrnoff navê pirtûka Hesenê Metê ye ku nivîskarekî Kurd û derveyê welêt e û li Swêdê dîjî. Hem nivîskar, hem jî wergêre. Di vê kurteçroka bi navê xwe yê biyan "Smîrnoff" de 14 mijarên cihê, 14 tîpên cihêreng û balkêş ji xwe re kiriye dabaş.

Hesenê Metê di pirtûka xwe de, bi pirranî cih daye tîpên ku li derveyî Kurdistanê, li Ewrûpayê dijin û heta jê hatiye, xwiye wan, kurmê wan, xwezaya wan, daxwaş û fantaziyen tîpên xwe, ne bi dawiyeke xweş û ne jî xerab anîye ziman.

Mijarên ku li ser rawestiye, li ser bingehêke zexim, pêşî kevirêne qorzi yên çirokan daniye û bi zimanekî xweş û sivik ew honandiye û xemilandiye. Hesenê Metê, hem di honandina çirokan de, hem jî di warê bikaranîna ziman de hostetiya xwe û jêhatibûna xwe daye nîşan.

Ziman, hem jî aliyê gramerî ve, hem jî, ji hêla bî wêj (îdyom), gotinê pêşîyan



Pirtûka Hesenê Metê, Smîrnoff

# 'Kîjan stranbêj dihêle ez salekê li qaseta wî guhdarî bikim'

Têkiliya te bi hunerê re çawa dest pê kir? Ev têkili gavek bû bi alyê sazvaniyê ve an tiştine din hebûn li dû nivîsandina van sazên te danîne?


Dema ez biçûk bûm, min ji stranan pirr hez dikir û min tim distra. Lê dengê min bi kérî dengbêjiyê nedihat. Ji ber vê yekê ez ho (hîn) bûm kemanê û bi dû re min dest bi awazvaniyê kir.

Demeke dirêj te bi Koma Armanc re kar kir û we çend qaset derxistin. Niha tu bi çi awayî li vê paşerojê dinihîri?

Bi rastî ez ne poşman im li ser wan rojan bi rindî û nerindîya xwe ve. Êrê tenahiya her yekî nedihat xuyakirin lê, hevaltiyeke pirr hêja di nav me de hebû. Lê destine nehuner mend û biyanî ketin nav me. Hiştin ku ev avahî tev bê hil-weişandin.

Berê muzîka Kurdî li ku derê ye, ci asteng hene ji nûbûn û pêşketina wê re?

Rewşa muzîka Kurdi girêdahî ye bi rewşa mîletê Kurd ve. Ji ber ku pêşkitina muzîkê girêdahî bi rewşa pêşketina aborî û civakê ve ye. An jî divê mirov xurttir be ji vî karî re û



## MISTEFA OSÊ

Di sala 1964'an de ji dayikê bûye, ji hêla Tîrbêspiyê ya başûrê rojavayê Kurdistanê ye.

Niha li bajarê Helebê bi dengê kemana xwe re her şev dibe baskek û li laşê welatekî bêkuştin, kîn û zikreşî digere. Pêwendîya M. Osê bi kemanê re kevin e û rehêن xwe berdide dema zarokatiyê. Li Zanîngeha Helebê, Fakulteya Hendeseyê Beşa Mekanîkê kuta kiriye.

jsazgehine taybeti hebin Ji bo ku li hunerê xwedî derkevin û berpirsiyariya hunerê hilînih.

Mîna hevgirtin an jî gîhiştîneke hunermendan bi hev re û pêşkêşkirina alîkariyê bi wan re. Lê mixabin roja îroj bêhna vî karî nayê.

Strana Kurdi bi navê çend hunermendêni bi nav û deng ve hatîye girêdan, rewşa strana Kurdi bi ci rengî ye?

Ez dixwazim bersiva vê pirsi bi pirsekê bidim. Ew jî ev e. Kîjan ji stranbêjê niha yêñ bi nav û deng, wê bîhêle ku ez saleke bi tenê ne bi salan li qa-

seta wî guhdarî bikim? Mihe-med Arif Cezrawî mir, lê dengê wî hîn tê guhdarîkirin. Gelek jî hene ku hîn zindî ne lê dengê wan miriye. Ma qey em dengek wek ê Tahsin Ta-ha, Mezherê Xalîqî û Eyaz Yû-sif nema dibihsin?

Dengekî wek ê Mezher ga-va bilind dibe, guhdar koça xwe pê re ji erdê radike û difi-re esmanan.

Qaseta xwe we bi dengê "Şahîban" derxist. Çar stran jî ji sazên te ne. Belavbûn û dengê qasête ne li gor te dix-west çêbû, ciima?

Qaseta Şahîban hat pişî

çar salan ji rawestandinê. Geh min deng nedidit û geh jî min kesen ku bi min re bidin saz me nedidit. Heta ku ez pergi Şahîban bûm û rastî sazvanê orgê yê hêja Şiyar bûm ku gelekî alî min kir. Ji ber ku he-ta bi rîtma stranan û program-kirinê li ser orgê wî dewsâ ge-lek sazine din dagirt. Stranen min ên di qasête de ev in: Ci Mizgîn e, Jîn û Jiyan, Êrê Dayê û Sond. Li ser kêm belavbûna wê dibe ku ji ber tek-nika wê ya tomarkirinê be ya pirr li şûn bû. Bi rastî vê yeka hanê gelekî ziyan gihande me. Lê em ci bikin ji destê me der-

ket.

Ji awaz û sazên ku di-gîhêjin me ji Kurdistanê û derve, ci ji wan hêviyê dikî ku ji te re ji bo muzîkeke Kurdi nûjen bê holê?

Em bi hewceyi stranekê ne ku, temenê wê dirêj be. Qaset pirr têñ cem me, nexa-sim ji bakurê Kurdistanê. Ev tişt dihêle ku hêdi hêdi bingehêk ava bibe. Ev jî cihê pesinê ye.

Bi taybeti Kurdên "Sûri" ci li muzîka me zêde kirine?

Di vê pêvajoyê de navê yekemîn ku xwe derdixe holê navê Mehmûd Ezîz e. Divê ji bîr neyê kirinê ku, Mehmûd di bajarê Tahsin Taha û Beşsar Zaxowî de cihêkî hêja girtiye. Em ji bîr nekin ku, "Mihemed Şêxo mamosteyê strana welat-parêziyê bû. Ev reng li ser destê wî hate damezirandin. Aramê Dîkran û Seîd Yûsif, dîlanê Kurdi têr kirin bi stranê gelêri û sivik.

**Hevpeyîn :  
Ebdulhelîm Yûsif**

# Ji başûrê rojava kovarek: El Hîwar

## M. Hemo

**Efrîn**-Di vê dawiyê de di meha Tîrmehê de li başûrê rojavayê Kurdistanê kovareke nû derket. Ev kovar hejmara yekemîn derxist bi navê

"El Hîwar". Yanê bi Kurmanci "Hevpeyîn" Kovar bi zimanê Erebî, di bin siya Partiya "Yekîti" de dertê.

Gava ev kovar ket deşte rewşenbiran, kesi ji wan bawer nekir ku, kovarek weke vê demokrat ji bin siya partiyê derkeve. Ji ber ku, van partiyên hêla başûrê rojavayê Kurdistanê ji bili doza "ez eziyê û xwezaniyê" doza tiştikî din nekirine. Lê ev kovar a "El Hîwar" bi rastî dengekî serbest e. Her nivîskarek li gorî nêrîna xwe tê de nivîs dinîse. Pirraniyên wan li ser kîmasiyên partiyâ û rîberen wan nêrînen xwe dane xuya-kirin, bi giştî jî li ser pêşveçûna tevgera Kurdi. Eger ev kovar bi vî rengî serbest ber-dewam bike, şoreshêke mezin e di çanda Kurdi de. Lê em bi hêvî ne dayîka vê kovarê bi sir be ta karibe zaroka xwe

xwedî bike û sêwî nehêle.

Komîteya deranîna vê kovarê di destpêkê de gotarek di bin navê "Ji bo mirov û dozen xwe yêñ niha" nivîsine. Gotarek gelek giranbuha ye û demokratik e.

Gelek babeten din jî, di vê hejmarê de hene, wek: "Afîrandinê pêşî di tevgera Kurdi de" Nivîskar; Şiyar Silêman, "Têbinî li hawêr tevgera neteweyî-Demokrasiya Kurd" Bi pênuşa; B. Haronî hatîye nivîsandin û nivîseke felesefi ye, "Kurdolojî" bi pênuşa lêkolînerê Kurd Prof. Şeref Eşîr, di gel hevpeyîne ke wî, "Ereb û Kurd- Nêrîna Erebî li doza Kurdi" bi xameya Dr. Berzan. Her wekî din di vê hejmarê de çîrok û hel-best jî cihêkî xwe girtine.

## KEVIR TOL DİBE Bİ XWE CİHÊ XWE DİGIRE

Di van dawiyen de bi guherîna cîhana nû re, bayekî guherokî bi dizî di esmanê Kurdistanê de bîlind zivirî. Li başûrê rojavayê Kurdistanê di bin hênkahiya vî bayê bi dizî

de, rewşenbirên Kurd kani-bûn bizana û ber biavêtina. Ên ku ji roja xwe naskirî de zimanê xwe kirine nav di ranen xwe û guvaştine, hinekî zimanê xwe sist kirin. Ê ku zaye û nezaye xwe dan za-yin.

Hinan ji wan ji rejîma Sûriyeyê destûr standin, berhemên xwe çap kirin. Hinan jî bêyî rejîma Sûriyeyê destûrê bide wan berhemên xwe çap kirin. Lî rejîma Sûriyeyê jî di bin vî bayî de çavên xwe lê damirandin. Hin kesen welatparêz jî kovar û rojname deranîn. Hema pirraniya wan rewşenbiran li dervayî partiyan e û tev jî, ji rewşa partiyan ne razî ne. Gelek rexne li partiyan û rîberen wan dikin. Dibêjin: "Partiyê me dîktatörî ne, ne bi xwekaran dikin û ne jî dihêlin ji bili wan kesek bike. Ev e rojnameya Welat, li bakurê Kurdistanê dertê û bûye dengê hemû mîletê Kurd. Ji ber nêrînen her ronakbî-rekê/i belav dike û li ser çar hêlén Kurdistanê dinivîse. Hişt ku bêhn ber bi rewşenbir û nivîskarek Kurdi were



Kovara El Hîwar li başûrê bicûk ji alyê partiya Yekîti ve tê derxistin.

## Cûdî

Şeva reş, marê reş, dilê reş, sis-tema reş, kîsê reş. Her tiştê reş, navê reşiyê, tu hêviyên dilxwe-şiyê nade mirovan, yan bi vî a-wayî navê reşiyê hatiye naskirin, belkî ji roja dinya hate avakirin heya vê rojê.

Belê ev jî weke ku dihêt tê xu-yakirin, ne ji bo rengê xwe yê çav dibine, belê dikarim bibêjim ji bo wateyên ku jê dihêñz tê-n naskirin. Ji vê jî, heya mirovén bi rengê xwe reş pirr nexweşî girtin ji aliyê mirovén bi rengê rûyên xwe spî, ew spiyê xwe-danê dilên reş, berpirsiyaren rejimên reş, wek ku dîrok dide-xuyakirin, wan mirovén dilreş li mirovahiyê nenêrîne. Tenê li reng nenihêrtine, ji vê jî zorî gi-handine mirovahiyê û ji vê jî mi-rovê reş maye di dawiya mirovahiyê de heya demeke dirêj. Dûri azadiya mirovan, wek ku pîr-tûkên mêmüyî (dîrokî) didin xuya-kirin, ew kesê reş maye kole û maye di taristana jiyanâ mirovan de û maye di quncikên tarî de, ji dîroka mirovan û lê hatiye nêrîn. Her wekî ew dehbe ye yan de-war e û hatiyezanîn û naskirin gerek e ew bijî, ji bo kar bike û kole be li ber dergehê koledaran, bê azadî û bêyî ku mafêni mirovan ji wî re hebe. Ji vê jî navê koleyân û koledaran peyda bû, di dîroka jiyanê de.

## EM XWEDÎ DÎROK IN

Lê gelo; ew mirovê bi rengê xwe reş maye kole? Û karker bi berjewendê koledaran re; bi rastî na.

Ji ber ku di nava wî mirovê reş de, mirovahî hebû û viyana azadiyê hebû û rastiya wî ne de-war bû û ne dehbe bû, xwendin û zanebûn di nava wî de peyda bû. Zanî koletî û koledarî ci ne û jiyan û azadî û welat û serxwe-bûn nas kir û ji bo serhildana mezin li hemberî koledaran û kedxwaran rabû. Li dijî mêtîn-geran wek ku me dîlî û me bihis-tî û heya iro jî em dibînîn û dix-wînîn, şoreş hatîn û dihêñ pê-xistin û rabûne û radibîn û bi ser-kevtinî gihane dawiya têkoşîna xwe û azadiya mirovahiyê kirin paya xwe û gelê xwe. Li vê derê em Kurd ci ne. û em kî ne? Me ci kiriye û em ci dikin?

Berî her tiştî em ji mirovén wek her mirovê li ser rûyê qadê, mafêni me jî gerek e wek mafêni her gelê di cihanê de hebin. Me dîrok heye, me cografiyek heye, her-tiştê ya welatê me heye, sînorêñ welatê me Kurdistan bi welatêñ der dorêñ xwe re hene û xuya ne, mêmüyê li ser me nivisi-ye, ji berî hezarêñ salan û em ji nava her-çeya Kurdistanê derkettine.

KÎNA DIL  
LI HEMBER DİJMÎN

Lê em ci ne? Ez bawer im em ne tu tişt in, heya ger bibêjim em mirov in ev gotin ne rast e. Ji ber ku em mafêni mirovan li ser xwe napecirin û em newêrek



# Kîsê reş û rastiya dîrokî

in, li hember dijminen xwe em kole ne, ji bili xwe re û mixabin em bi koletiya xwe ji razî ne. Ne-wel wan kesen bi çermê laşen xwe reş li bîra min e, sala 1979'an wê demê ez serbazek bûm di nav artesa Sûrî de, li Libnan, hinek ji leşkerê Neteweyen Yekbûyî yêñ ku leşkeriya xwe bi kar dianin di nav-bera Libnan û Cihuyan de li başûrî wî welati, ew ji serxweşbûn bi giranî. Ji leşkerê dewleta "Pîro" bûn, zimanê wan İngilizî bû, he-valeki min ew ziman dizanî, bi wan re peyivi, lê wan ci bersiv dida-ne?

Gotinê: "Tu bi me re nepeyiye", wisa ji wî re digo-tin û bi xeyd û kin, digotin" Tu nepe-yive bi me re, tu spî yî". Kîna spiyen ketibû dilen wan û li spiya dinêrin her wekî spî ne mirov in ji ber mafêni mirovan li ba wan spiyen ne hatine naskirin, zilm û zoriya bi serên wan de anîn ji berî seden salan li wî ci hî hemû hat ji bîra wan.

Gelo em di rûbarê kesen wek van kesan de, em ci ne û em ci ji xwe re dikarin bibêjin?

Em bi dijminê xwe re bê kin in û ew bi me re ne biray e. Ji ber ku ew qîmê bi biratiya me nayîne û me ji xwe re bira nape-jirîne. Tenê li me dinêre bi çavê koletiyê. Her wekî spiyê berê li reşan dinêri û em ji koletiya xwe ji wî re dipejirin û bi dilekî pirr xweş û geş, ne tenê ev ji belê em xwe pê nav ji didin. Vêca em kî ne û ew kesen reş kî ne?

Ey Kurdê bi nav, kuştinêñ bi ser bav û bapirêñ te de hatin, te

ji bîra xwe birin, te Şemzînan û Palo û Gênc û Hanî û Dêrsim û Eleqemş ji bîra xwe birin. Te mil-yonên mam û pismamên xwe yêñ ku faşıya Tirk ew kuştin, bi tiving û singuyan û daleqandin û avêtin avên kûr ji bîra xwe birin.

MÊRANI  
LI HEMBER KÊ?

Tu mîr i? Mêrxas i? Ji kî re? Tu mîr i ji xwe re, ji nas û kesen xwe re ev rast e. Ji berî bîst ro-

dibêjî çima xebatek nekirin ji we-latê xwe re? Çima xwe negihan-din rîzêñ her gelêñ cihanê? Bi çandan car te gotiye ger pêşiyen me xebateke rast bikiran, vê gavê emê ji di welatê xwe de bû-na, li ser xaka xwe bûna, emê xwendanê rûmeteke mirovati bû-na.

Ger tu wiha dibêjî û ev in go-tinêñ te, li xwe binêre tu ci dikî? Ger tu li xwe dinêri, hevalkarê partiyeke Kurd û karek, xebatek, tevgerêk te heye. Lê mixabin ew hemû ne ji bo felata gelê Kurd e û ne ji bo wî bû tu caran, ne ji bo welat bû, ne ji bo hînkirina gelê Kurd bû û ne ji bo mafêni wî bû. Ne ji bo wê kîmasiya bav û kalêñ te ke-tinê dagirî. Belê ji bo kesaniya xwe, ji bo navê xwe, ji bo tu bîbi axa li ser serê gelê xwe û ew ji te re bi-be kole, yanî ji bo tu gelê Kurd bîkî koleyê kolan, ji ber ku tu bixwe kole yî.

## HÊVIYA HÎNBÛNÊ

Wî bavê te yê nezan, nexwen-da, tu dianî di dibistanan de, hêviyekî wî hebû ger tu hîn bibî, zana bibî, belkî tu wî ji bindes-tiyê, ji zorê, ji lêdanêñ bêdadi, ji koletiyê xelas bikî. Lê mixabin ew hêviya bavê te bi avê de te berda, ne tenê te bav bêhêvî kir. Belê te bav ji bîra xwe bir, heya te zarokêñ xwe neparastin. Tu ne wek dewarekî jî, ji ber ku me-hîn dema dizê kewoşka wê girê didin û wê berdidin, ew wê kewoşka xwe diparêze. Lê tu ey xwendanê hêja heya vê rojê tu dijû-nan ji bav û kalêñ xwe re didî û

zin dikî û bi xwendin û hîn dikî, ji bo ci?

Ji bo bê kuştin bi desten dij-min, ji ber ku Kurd e. Bi rastî tu bi xwe bi vî navî ne razi yî û te dixwest û te divê vî navî ji rabikî. Lê mixabin tu nikarî, ji ber ku dijmin nas kiriye Kurd û çiqasî tu wî reng bikî naye guhertin û wê bimîne Kurd û kuştina ne dadî felat nabe. Yanî dimîne ji bo ko-letiyê û dawiyê ji bo kuştinê bi desten dijmin, çima xwendevanê Kurd? Çima wiha yî? Çima tu dijminê xwe yî?

Bi rastî pirraniya xwendevanê Kurd ev rewşa wan, di vê rojê de li her cihî ji Kurdistanê, daxwaza wan doza pereyan e, yê doktor dixwaze nexwesxane-ya wî hebe, zagonvan dixwaze bibe berevan "berdevk", mihendiz dixwaze bibe xwedan kar-mendike mezin û bibe berpirsiyar û hemû ji bo danheva pereyan, yanî mirov dikare bibe he-mû nandoz in, nimûneyek ji van xwendevanê bilind ên kî ji za-nîngehan derketine, endozêñ xwendevan, xwendanê kîsê reş.

Pêwist e em pirsa vî kîsê reş bidin xuyakirin, ka pirsa wî ci?

- Ew bi xwe belkî bi rengê xwe ne reş be, hemû çaran û ger reş ji be reşya wî ji wek reşya rûyên kesen Efrîqayê, di nava wî de spî ye. Sedemîn jiyanâ mirovan tê de hene, lê mixabin ji a-liyê xwendevanê Kurd ve, ne tenê reşya rengê belê reşya dil û mejîye, jehra maran e, çandîniya tirsî ye, ne welatparêzi ye, ne wêrekî ye, pejirandina ser nivzîye razibûna bi koletiyê ye, dijîti û şerê welatperveriyê ye, dijminahiya rastiyê ye, dijminahiya mafêni gelê Kurd e, hevalkarîya kedxwariyê ye, xizmet û kar û biratiya ji mettingerê Tirk re, e kê kal û jinêñ Kurd bi sedan heza-ran daye ber singuyen tivingan, kê zarokêñ Kurdan xistiye bin simen hespêñ cendirmen xwe, ev in tiştên xwendevanê Kurd dibînin di nava kîs de û bi van tiştan razîne û pirr dil xweş in.

Ger berî vê rojê bûya belkî mirov sedeman ji wan re bidita, yanî mirov bigota çare nîn e, xem nîn e ji bo xebateke rast ji bo gel û welat, ji ber ku kes li pişta wan nîn e yanî derfetên ra-bûnê nîn in. Lê vê rojê rastî ne wiha ye û ew ji vê dizanîn lê ji ber ku dizanîn, ji vê hêla ne baş digirin, ma nizanîn iro şoreş li dar e? Ü xwendevanê zanînge-han agirê wê pêşemîn pêxistîne. Kadroyen vê şoreş doktor in, mihendiz in, xwendevanê za-nîngehan e, pakrewanen vê şo-reş bi hîn û çîn bûn. Lê xwendanê xîret û rûmeteke bûn, ne par-sek û ne nadoz bûn. Dizanîn ew derewen ji wan dikirin ji bo Kurd û Kurdistanê bi wan derewan gelê Kurdistanê dixapandin û dixwarin û tu caran ji neketibû dilen wan ku xizmeteke rast û durist ji gelê Kurd re bikin.

**Wê bidomê**

Sala dawî bû, dê dibistanê bi-qedanda. Gava zengil lêdiket û xwendekar ji dersê derdike-tin û di bexçeyê dibistanê de bi hev re dileyîstin, ew bi tenê dicû li ser kevirekî rûdinişt. Ji xwe re bi dûr û kûr difikirî.

Tim û tim bicukiya wê di-hate bîra wê. Hevalen xwe ye zarokatiyê qet ji bir nekiribû. Ew bi ber çavên wê, wek şirita film derbas dibû. Pirr bêri-ya wan hevalen xwe yên bi-cük û bêriya welatê xwe kiri-bû. Hesreta welat di dilê wê de jan dabû. Gava ew hê bi-cük bû, malbata wê ji ber neçariya feqîriyê û békariyê, ji Kurdistanê koç kiribûn, çû-bûn Libnanê. Di bajarê Bêrûdê de ji xwe re cih û war cêkiribûn û li wê dijîyan.

Bavê wê wek hemû bavan ji wê pirr hez dikir. Gava ew ji dayîkê bûbû, navê wê Rozerîn danibû. Lé bavê wê jê re digot: "Roza min, delala min."

Roza bi fîkr, dîtin û ramanê welatparêziyê mezin bûbû. Bav û dayîka wê, ji re qala welat dikirin. Zilm, tehdî û zordariya hovîti berdewam dikir, dianin ziman.

Rozayê, bi hêvi bi dil û can guhdariya wan dikir û hesreta welat di dilê wê de zêde dibû. Roza hêviya ku dê rojekê ve-gere welat xistibû nav dilê xwe. Û li benda wê roja ve-gerê bû. Lé ew qet vala nedisekinî. Di nav Kurdên ku di Bêrûdê de dijîyan de, kar û xebata welatparêziyê dikir. Ji wan Kurdan re digot: "Divê kar, xebat û jiyana me ji bo rizgariya xaka Kurdistanê be. Divê em bi dil û can alikariya şerê azadî û serxwebûna gelê Kurd bikin. Divê em vegeerin welatê xwe û di nava qada xebat û têkoşînê de, di eniya şer de cihê xwe bigirin." Roza di Hemrayê de, di Zeytûnê de, Faqhanyê de û di hemû taxên Bêrûdê de digeriya, bi keç û xorîn Kurd re têkiliyên xwe germ dikir. Di Bêrûdê de her roj şer hebû. Hêzen pêşverû û paşverû bi hev re şer dikirin.

Carina partî û rêxistinê Filistîniyan bi xwe bi xwe, bi hev re şer dikirin, şerê bîrakujiyê dikirin û bi dehan kes bêsebeb dihatin kuştin. Di navbera rêxistinê Filistîniyan û Hizbullahiyan de ji şerekî giran çêbûbû û pirr kes hatibûn kuştin. Firokên Cihuyan (İsrail) ji her roj dihatin û nav û der dora Bêrûdê bombebaran dikirin. Bargehîn leşkerî yên Filistîniyan xerab dikirin, pirr kes dihatin kuştin an bîndar dibûn. Ev roj ji, firok-

# Rozerîn



## Lokman Polat

hatibûn çend bargeh ku di Feqhanyê tijî birîndar bûbû û çend kes ji miribûn. Roza ji ev roj li Feqhanyê bû û piştê bombebarankirinê, alikariya Filistîniyan kiribû, birîndaran biribû nexweşxaneyê. Lewma ji, ew roj bi şev dereng çûbû malê.

Di malê de dayîka wê nan, xwarin hazır kiribû. Lé wan nanê xwe nexwaribûn, li benâa Rozayê sekinibûn. Bavê Rozayê jê re got: "Tu li ku derê may, me meraq kir? Tu çima ewqas dereng hatî mal?"

Roza: "Ez cûm nex-weşxaneya Feqhanyê, min alikariya birîndarê Filistîniyan kir."

Roza mêze kir ku kêfa diya wê û bavê wê li cih e û rûken in. Ji xwe re di hundirê xwe de got: "Ev iro xêr e, kêfa malbata min pirr li cih e."

Hemû bi hev re rûniştin, nanê xwe xwarin; bavê wê diaxî û dikenîya. Dayîka wê ji pirr rûken bû. Rozayê bi henekî ji bavê xwe re got: "İro tu û dayîka min pirr bi rûken in; ji bo ku firokên İsrail ha-

tin Filistîniyan bombe kirin, gelo kêfa we hat?"

"Na, keça min. Tu dizani em li dijî Cihuyan in. Em pişta Filistîniyan digirin, ew ji wek me Kurdan miletikî bindest in. Kêfa me ji bo tiştekî din hatiye, dê dayîka te paşê ji te re bibejê."

Piştî nanxwarinê, dayîka Rozayê jê re got: "Keça min, delaliya min, tu mezin bûyî, hati ber mîran, divê em te bi-zewicînin. Tu bibî bûk, kêfa min û bavê te ji bo ku emê

Bavê wê: "Keça min tu li ku pêşmergetî li ku, şer biki. Ez dibêjîm pêşmergetî karê mîran e,"

Roza: "Bavo, tu dizanî, gotineke pêşîyan heye, dibêjin "Şer şer e, ci jin e ci mîr e." İro li Kurdistanê bi sedan keç û jin di çiyayan de ne û şer dikin, wêneyen wan di rojnameyê de derketibû, min bi te nişan dabû. Te ew dît ku, bi dehan ji wan şehîd ketibûn."

dilana te bibînin û tu bi xêr û xweşî bizewicî. Lewma kêfa me hatiye. Mala apê te xeber şandine, dixwazin te ji kurê xwe re bixwazin. Ji bo vê yekê fikra me dixwazin, ji bo vê zewacê ez nîrîna te pirs dikim, nîrîna te ci yê? Divê em bersivê ji wan re bişînin."

Roza: "Ez tu bersivan na-sînim ji tu kesan re."

Dayîk: "Keça min, edî tu

mezin bûyî, divê tu biçi ser nesîbê xwe."

Roza: "Belê dayê, ez biçim ser nesîbê xwe, lê nesîbê min ji, welatê min Kurdistan e....!"

Piştî vê axaftînê dayîka Rozayê cû di odayê (menzelê) de ji bavê wê re got ku Roza naxwaze bizewice. Mirûzê bavê wê tehl bû, cû bi Rozayê re şer kir. Roza ji bavê xwe re got: "Ez naxwazim bi-zewicim, ezê bizewicim ci biki, zarok bînim û tim li malê bibim jina hefskirî. Ez

dixwazim bibim keça azad, jina serbilind. Di xwen û xeyalê min de, di nav dilê min de ev heye ku, rojek ez vegekim we-lat, di çiyayê Kurdistanê de wek pêşmer-

geyên leheng li dijî dijîn şer biki. Ezê bibim pêşmerge "

Bavê wê: "Keça min tu li ku pêşmergetî li ku, şer biki. Ez dibêjîm pêşmergetî karê mîran e,"

Roza: "Bavo, tu dizanî, gotineke pêşîyan heye, dibêjin "Şer şer e, ci jin e ci mîr e." İro li Kurdistanê bi sedan keç û jin di çiyayan de ne û şer dikin, wêneyen wan di rojna-

meyê de derketibû, min bi te nişan dabû. Te ew dît ku, bi dehan ji wan şehîd ketibûn."

Di navberê de çend roj derbas bû, rojek Roza ji diya xwe re got: "Dayê min biryar da ku ezê edî biçim, xwe bigi-hînim nav refîn pêşmergeyan. Meraq mekin, xem nexwin, ji bavê min re ji bibêje bila pirr ber min nekeve. Piştî ku ez gihiştîm welat, bi soz ezê ji we re nameyê bişînim."

Têkoşina rizgariya Kurdistanê li hemû aliyê welat xurt bûbû, şerê azadiyê yê germ her diçû geş dibû. Roza ketibû nav refîn pêşmergeyan ü gihiştibû çiyayê Kurdistanê, li herêma Serhedê li dijî leşkeren dijmin ên dagirker şerêki bêhempa ji aliyê mifrezîn pêşmergeyan ve dihat kirin. Wan, her diçû zincirê kolanyalizmê dişkandin. Di çiyayê Serhedê de û di navça Norşîna Mala Hezret de, mifreza ku Roza ji tê de bû, eman û mecalê nedidan dijmin, her roj bi dehan bi sedan ji dijmin dikuştin. Piştî çend meh derbas bûbû, Roza sozê ku dabû diya xwe anî cih û ji malbata xwe re nameşand.

Rozayê di nameya xwe de ji malbata xwe re wiha nivisandibû.

"Yadê, Yabo!

We baş nas kiriye derdê gelê Kurd ci ye, we riya xela-siyê dîtiye. Divê mirov biza-nibe û bibîne û nas ji bike, lê belê qanûnên jiyanê hene, yet ji wan qanûnan ji ev e: "Ji bo ku em xweşiyê bi destê xwe ve bînîn, zor û zehmetî gerek e, ev ji rastiyek e. Hûnê bibêjin keça me çûye şer, lê hema divê hûn bizanîbin ez ne keça we tenê me."

Ez keça gelê Kurdistanê me. Hevalen min tev keç û lawên we ne. Daxwaza min ji we ew e ku, hûn li pey min xurt bibin û di riya şehîdan de bimeşin..."

Name gihiştibû destê bavê Rozayê. Bavê wê name ji dayîka wê re ji xwend û paşî ji jina xwe re wisa got: "Rozaya min, Rozerîna min, dêmek nesîbê te kurê apê te nebû, çiyayê Kurdistanê bû, me te ji Kurdistanê re kir bûk. Serkeftin û serfiraziya me, dijminê xwînxwar qehr bikin. Xwedê li pişta we be, keça min ya a-ziz û delal."

Piştî demêke dûr û dirêj. Roza, li Norşînê ku li ser Bi-lîsê ye bi lehengî şer kir û şehîd ket, koçî nav kerwana şehîdîn Kurdistanê kir.

# Qerekterê dagirkerye yek e

● Dem û cih ci dabin bila bibin, dîroka dagirkerye vekirî ye. Dagirkeri berî ku bikeve cihhekî, ji xwe re îdeolojiyekê peyde dike. Îdeolojiya ku bikaribe dilen bindestan bikewîne û tê de ji xwe re cih veke. Lê, îdeolojiya dagirkerye çiqas bi gotinê xweş tê xemilandin bila bê, bêdil e û bi xapînokan tije ye. Bêdil û xapînok e. Bêdili û xapînok qerekterekî dagirkerye ye. Soz dide, lê li wan xwedî dernakeve.

## Gavan Koçer

"Demâ bavê min û hevalên xwe hatin vir, xwedî xewnekî bûn. Ew gişt ciwanen bi şewq bûn, bi siyasetê ve mijûl dibûn û çep bûn. Ew li Almanyayê muxalefet bûn û di şertên gelek zehmet de ji cehnema Hitler filîtin. Hingê ew hatin vir ku di muameleya pratikê de xewnên xwe bi cih bînin.

Wan bi îdealizmeke tije û xwîna ciwantiyê dixwestin xewna bêdawî ya Cihuyan bikin rast. Xewna pişt re ve gerîna welatê pîroz, welatê xwe. Xwedayê İbrahîm, İsak û Yaqûb ji Ciyyatê Neboyê nişanê Musa kiribû. Welatê pîroz, ku di nav koçberiya sed hezar salan de di bîra Cihuyan de cih girtibû û xwe parastibû, lê wek Mûsa, wan jî li vî welati destûra bicihbûnê negirtin.

Wan dixwest di civatekê, ku li ser îdeyên azadî, wek hêvî û biratiyê -ev îdealen

cepênen Ewrûpî yê herî radikalî bûn, ku di Îsraîla îroyîn de civata kîbütziyan nimûneyeke- de tê avakirin, saz bikin.

Bi gotineke din, wan dixwest ji bo civatê modelekê çebikin ku, ji bo dînyayê ji ev model bibe wek nimûne. Nimûneyê ku yê din rûmet bidanê. Xewna wan ji vê mezintir bû û hê wê de dicü. Ev model -dewleta İsrail- hat çekirin. Di nav dînyaya Ereban de bi çekirina dewleta İsrailî re, wan dixwest ronahiya zanînê bidin Filistîniyan û gelê Ereban ku li hawirdorê dijîyan. Bi kurta, bîr û baweriyeke politikî bide girseyen Ereban û alîkariya wan bike ku ew gîraniya feodalizmê ji ser xwe biavêjin. Avahiyen civakî yê kevin dê bi tevayî birûxiyan û wan dê rista ku trumpeyên Josva listin -wîha sûrîn Jerîko hatin hilweshandin- bilista.

Dema ev yeka hanê bi

cih hat, dê hengê gişt bi hev re di aştiyê de heta bêdawiyê bijiyana; Filistîni, Ereb, Cihu, Kurd, Ermenî. Lî, wek ku tu dizanî û wek tu dibînî, wiha neçû."

Gotinên jorîn yê Zeev bûn. Zeev wênekeşekî İsrailî ye. Li wir hatiye dinê û mezin büye. Demâ min gotinê Zeev di pirtûka Jarl Munch (Nücevanê dewleta Norwecê yê Rojhilata Navîn bû) -Keştiya li ser Nilê, 1991- dixwendin, ez bi qedereke hûr û kûr li ser wan hiziriym. Naveroka hevokan gelek xweş bû û bala min kişand. Nivîskar ji bi zimanekî delal nivîsibû. Mirov diket xeyalên mîtolojiya pîramîdan, Nîla mîstîk, mîzgeft û monumenten Qudusê... Lî, peyder pey bîrê xwe rakişand û hat dinya rastîn. Rûerdê xwe kişand ser hev. Dîrok nêzîk, zeman kin bû. Sebra û Chatîla ketin bîra min. Şirîta nav Sabra, Chatîla û zîndanê Diyarbekirê vebû. Jenosîdên sala 1982'yan xwe li ser vê şerîdê rez kiribûn. Şirît dirêj bû û cih da qırkîrinê Newala Qeseban, Gelîyê Zilan, Pîran, Dêrsim û ber bi bêdawiyê ve çû.

Belkî Zeev di gotinê xwe di bi dil bû. Demâ qırkîrinê Sabra û Chatîlayê dîti bûn, ji İsrailî nefret kiribû.



Dagirkir Sedam li bajarê Helepçeyê bi çekên kîmyewî ji 5 hezâri bêhtir Kurd dabû kuştin

Lî, tiştîn ku ew dibêje û ji bav û kalen xwe girtiye, ji bo dagirkerye nimûneyen herî berbiçav in. Dem û cih ci dabin bila bibin, dîroka dagirkerye vekirî ye. Dagirkeri berî ku bikeve cihékî, ji xwe re îdeolojiyekê peyde dike. Îdeolojiya ku bikaribe dilen bindestan bikewîne û tê de ji xwe re cih veke. Lî, îdeolojiya dagirkerye çiqas bi gotinê xweş tê xemilandin bila bê, bêdil e û bi xapînokan tije ye. Bêdil û xapînok qerekte-

rekî dagirkerye ye. Soz di de, lê li wan xwedî dernakeve.


Generalê kovboy Schwartzkopf di serdana xwe ya li Norwecê, qerekterê dagirkerye -cawa bû- ji devê xwe derxist: "Durûti büye toreya me rojavahiyen. Ev yeka hanê büye kultura me. Em behsa aştiyê dikin, ji bin re jî çekan difiroşin ku şer bidome." Ev qerekter e ku, ji Selçukî û Osmaniyan bigire heta iro Kurdistan dagir kiriye.

## XACEPIRS

**Çeperast:** 1-Helbestvanek ji Şîli (1902-1973) Nûnerê herî bijarte yê helbesten siyasi ye. Di 1971'yan de Xelata Nobelî standiye. Li gelek welatên dînyayê konsolosya Şîli kiriye. Di 1972'yan de dev ji berendamîsi serokkomariyê berdiye û cih dide Salvador Allende. Çend ji berhemên wî ev in: "Bîst helbesten evîniyê û straneke bêhêvi" "Di dil de Spanya", Rêzikên Kapitanî û hwd. Di wêne de tê dîtin 2-Pejikandin, dapitin/ Notayek/ Kirina karekî bi awayekî qenc/ Pile/ Vexwarîn/ Xebat, şîxul 4-Xusîsî/ Şirove 5-Heqîqet 6-Mehelel/ Li Swisreyê navê çemekî 7-Li Rojhilata Navîn navê welateki/ Sozdayîn, belen 8-Di dîrokê de navê paytexta Asûriyan 9-Ilm 10-Serokê Şoreşa Oktobrê, îdeologê mezin/ Sembola Neonê

**Serejîr:** 1-Berevanîkirin, mudafe 2-Navê mehekî/ Mîrîn di timtela jinan de, nêremoç 3-Navê malbateke Kurd a navdar, gelek têkoşer û rewşenbir jê gîhane 4-Ezyet/ Navê xwarenek ji metbaxa Kurdan 5-Dîn/ Navê pêxemberê filehan/ Paşgirek ku meslek (pişeng) dide nîşan 6-Xwarineke bingehîn ku ji ardê genim çêdibe/ Sûc 7-Celebek şanoyê ya bi müzik/ Navê rojekê 8-Rengek/ Navê cisnek hespan ku koka wî ji Úris

## Amadekar: Rasto Zilanî



e 9-Amûreke mûzîkê/ Rih 10-Avahiyen ku tê de ticaret tê kîrin 11-Xuri, rivîn 12-Navê bexçeyê cenetê

### BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇÜYİ

**Çeperast:** 1-Albert Camus 2-Saet/ La/ În 3-Şn/ Kewê 4-Rêxistin/ Tar 5-Ol/ Ne/ Kebanî 6-Îcra 7-Daw/ Ew 8-Jî/ Sexte 9-İsa/ Xweş 10-Kriter  
**Serejîr:** 1-Astrolojî 2-La/ El/ Îsk 3-Berx/ Id/ Ar 4-ET/ Incas 5-Serwext 6-Teşî/ Xwe 7-Nik/ Eter 8-Al/ Nexwes 9-Mak 10-ETA 11-Siwan 12-Nêrî

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

### Bedelê abonetiyê razînin:

**Li derive:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkîye:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişîrin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

### Mercen abonetiyê:

|           |                |
|-----------|----------------|
| Li hundir | Li derive      |
| 3 meh     | 60.000 30 DM   |
| 6 meh     | 120.000 60 DM  |
| 12 meh    | 240.000 120 DM |

Hebû carekê ji caran, rehme li dê û bavê hazir û guhdaran, li gundekî hebû zilamekî karker. Bi şev û bi roj dixebeitî û ince debara xwe dikir.

Rojekê zilam rahişte nîr û haletê xwe. Gayêne xwe dane pêşîya xwe ku here cot. Meyizî ku, li ser devê riya wî çend zarok bi keviran didine du çêlikekî maran ku bikujin.

Zilam nîr û halet xwe ji ser milê xwe avêtin û bi wir ve bezî. Dengê xwe li wan kir, got: "Hûn ci diwxazin ji wî çêlikê maran? Ma ne guneh e? De haydê da ez we-rim cem we... Ezê ji we re zanibim."

Zarok tırsıyan û bezîn bi nav gund ve. Ji ber çavan winda bûn. Zilam cû ku bi nêre bê ma çêlikê mar birîndar nebûye. Çawa cû ba mar, mar xwe çend kire zilam û xwe li stûwê wî pêça. Got. "Ezê niha bi te vedim." Zilam got: "Eman, zeman min tu ji lepê wan zarokan rizgar kiriye. Min qencî bi ter kir, ne xerabî." Mar got: "Ez nizanim... Tu dijmin i. Ezê vêga bi te vedim." Zilam got: "De ku nexwe emê

Hebû nebû, li gundekî mîr, jinek û kurekî wan i şeş- heft salî. Ji ber ku kurekî bi tenê bû, gelekî rû dabûnê û bi delalî mezin kiribûn.

Sibehekê zû, zilêm bang li pîreka xwe kir û gotê: "Ka hermet, nîr û haletê min derîne. Ezê herim cot."

Pîrek rabû. Nîr û halet deranî û herdu ga berdane hewşê. Zilam rabû, taştê xwar. Nîr û haletê xwe avête milê xwe. Gayê xwe dane ber xwe û berê xwe da nav zeviyê. Kurê wî jî da dû, got: "Ezê jî bi te re werim." Zilêm dilê wî nehişt. Got: "Were lawo..."

Gihane nav zeviyê. Zilêm cotê xwe girê da û dest bi cotê xwe kir. Kurik li ber sersedê li binê dara behîvê rûniştiye. Ji xwe re bi axê dilîze. Malikan ji ax û keviran çedike. Dît ku tiştekî hat û li serê darê danî. Bang kire bavê xwe, got: "Wa yabol! Ka were ev ci ye?" Bavê wî hat, got: "Kurê min, ew teyr e." Zilam li cot vegeeria. Çaxê xeta xwe vegerand û giha sersedê, kurik dîsa got:

# Zilam û mar




herin cem hinekan. Bila me ji hev safî bikin." Mar got: "Ma em herin cem kî?" Zilam got: "Gayek wa li mîrga ha hê diçêre. Emê herin cem wî gayî." Mar got: "De em herin."

Bi hev re çûne cem ga. Zilam got: "Hal û rewşa min û mar ev e... De êdî tu me ji hev safî bike." Ga got: "Hûn insan in. We şîrê xav vexwariye. Heta ez golik bûm, we şîrê min ji ber min

didot. Ez mezin bûm we cot bi min kir. Ku ez pîr bûm, xwediye min kar kir min bi gurîne. Ez bezîm û min xwe li vê mergê girt. Serê min ji we naêşê. Ez we ji hev safî nakim."

# Bav û kur



ye?" Got: "Lawe min, ew teyr e, teyr..." Zilêm cotê xwe berdewam kir. Çaxê xeta xwe vegerand û giha sersedê, kurik dîsa got:

"Yabo! Te got ev ci ye?" Zilêm bi nermaryî got: "Berxîkê min, ew teyr e, teyr..." Kurik got: "Yabo de careke din bibêje." Bav: "Delalê

min, ew teyr e." Cotê xwe qedandin û vegeeria malê.

Salan da dû sala.n Zilam pîr bû. Hew bêjingek ji

Mar li zilam zivîrî got: "Ezê vê ga vê bi te vedim. Hûn insan ji me heywanan tevan re dijmin in." Zilam got: "Ka em herin cem rovî. Heke rovî jî wiha got. Tu êdî serbest i." Mar got: "Bila be. Emê herin cem rovî jî."

Dane dû hev û çûne cem rovî. Rovî got: "Xêr e halo? Ci meseleya we ye? Zilam got: "Min ev mar ji nav destê zarokan rizgar kir. Zarokan wê ew bikuştana. Piştî min ew rizgar kir, va xwe li stûyê min pêçaye. Dibêje: "Ezê bi te vedim." Édî min divê tu me ji hev safî bikî."

Rovî xwe nepixand. Bangkire mar got: "Wa mar! Tu ji ser milê wî were xwarê." Bû kufe kufa mar û xwe ji ser milê zilam avête erdê.

Zilam rahişte dar û mar li holê gevizand. Tu carê din pişta xwe neda neyarê xwe.

**Berhevkar: Jîr Dilovan**

azmên didît. Çavên wî gelek qels bûne. Kurik bûye xort. Édî ew kar û barê malê dike.

Sibehekê xort rahişte nîr û halet. Berê xwe da nav wê zeviyê. Bavê wî got: "Kurê min ezê jî bi te re bêm. Bêhna min di mal de teng dibe." Xort got: "We-re... Lî dîsa li min nebe bar." Got: "Na lawo na. Ez nabim bar."

Xort cotê xwe girê da û dest bi cot kir, zilam bi wezîna gopalê xwe, xwe gihande bin dara behîvê û rûnişt. Çavê wî hema tefsi-land ku tiştekî wa li serê darê daniye. Bang kire kurê xwe. Got: "Kurê min ew ci ye li serê vê darê?" Kurik bi zirt got: "Ma tu kor i? Teyr e, teyr." Zilêm deng nekir. Xort xeta xwe bire serî û vegeeria serseda bavê xwe. Zilêm dîsa got: "Lawo te got ew ci ye li serê darê? "Xort bi hêrs got: "Ezê vê misasê li patika serê wî bidim ha... Ma tu kerr i? Ne mi got teyr e teyr... Ez bi vî re ketime belayê lo..."

**Elî Mêrdînî**

Wezîrê Çandê yê Hikûmeta Kurd a Federal Şérko Bêkes:

# ‘Bakur serê laşê me ye’

## Zana Farqinî

Wezîrê Çandê yê Hikûmeta Kurd a Federal Şérko Bêkes di 1'ê Îlonê de hate Stenbolê. Di çarço-veye protokola Heyeta Enstituya Kurdi ú Navenda Çanda Mezopotamyayê (NCM) ú Hikûmeta Federal de ku, di 1'ê Tirmehê de li Hewlîrê hatibû ïmzekerin, serî li NCM ú Enstituya Kurdi da. Pişte ji bo çapemeniyê, li wir civînek çêkir. Dû re rojnameyan û DEP'a Rêxistina Bajarê Stenbolê ji ziyaret kir.

Êvarê saet li 19.00'an ji bo çapemenî û weşanxaneyên Kurd civîneke din çêkir. Wezîr û Şairê navdar Bêkes, li ser rewşa Başûr peyivî, agahîyan da û pirsên rojnamevan, weşanvan û besdaran bersivand. Ne bi tenê li ser kar û barêne wezareta xwe û gelşen xwe, her wiha li ser her mijari a-xivî, nêrîn û awirêne xwe diyar kirin. Bi çalakiyên xwe, li ser Başûr em agahdar kirin. Gelek tiştan got, di nav hin gotinên wî de gazin ji hebûn, rexneyên sergirti hebûn, daxwaziyên alîkarî û piştigiriye di her keys û fersendê de dianî ziman. Li gorî nêrîn û daxwazên wî diyarbû ku, me hemû yan dev ji kar û kirinên xwe berdانا û biçûna hawara Başûr.

Di hemû axaftinen wî de behsa demokrasiyê hebû. Li ser rewşa û tecrûbeyên başûrê Kurdistanê dipeyiû û dixwest ku hemû Kurd ji tecrûbeyên wan feyde bibînin, pratîka wan bibînin. Ji pirsên siyasi digazinand. Ên ku li ser peywir û warê xwe dixwest. Dixuya, jê re siyaset dijwar dihat. Di warê xwe de serbest diliviya.

Li gorî nûcê û daxuyaniyên rayerâne Hikûmeta Kurd a Federal, em hîn dibin ku, rewşa aborî qet ne baş e. Em bi xwe ji, van gazin û giliyên li ser rewşa nepak bûbûn şahid. Her wiha Şérko Bêkes ji dida zanîn ku, du abloqeyle li ser Başûr in. Ambar-goya Neteweyên Yekbûyî û ya Iraçê. Ji ber herdû abloqeyan. Başûr nikare jiyana xwe ya aborî bidomîne, karistan û fabrikeyên xwe bixebeitine. Bi ya wî diviyabû ku, Kurd li gorî “mercîn cîhanê” edi xwe biguherandina û bi riya dialog, aştî û bi peyva têcîrmân (tilsim) demokrasiyê têbîkîsiyana. Têkiliyên Telabanî, Berzanî bi Komara Tirk re wiha dinixrand. Wezîrê Çandê: “Danûstandin ji bo helkirina meseleya Kurd zor (pirr) pêwest e. Divê dialog hebin. Serrawestina PKK'ê ya yek alî zor çak (baş) bû.

Di bîryardana vê yekê de rola Mam Celal zor hebû. Ciwan (qenc) bû. Komara Tirk ket tengasîyê û di nav kes û xêrxwazan

Ereb Misirê ji xwe re wek navend, serek dibînin, her wiha Şair û Wezîr Bêkes, jestek ji Kurdên Bakur re kir û ev parce wek navend û serê beşen Kurdistanê nirxand. Bi gotineke din Bakur ji kir Misra Kurdan. Wiha digot: “Dijmin dema planen xwe li ser doz û meseleya Kurdi çedîkin, Kurdistanê yek parce dibînin. Her wiha divê em ji xwe wisa bibînin. Ger parçeyên Kurdistanê laşê me be, Bakur serê me ye, çavê me ye.”

aştîye de hatibûn tecrîtkirin.”

Birêz Wezîr bi vê daxuyaniyê nema, anî ziman ku bi bîryardana şerrawestinê re, PKK'ê xwe di warê stratêji û taktikan de guherandiye.

## • WELATÊ KURDAN YEK E'

Di axaftin û beyanên xwe de Birêz Şérko Bêkes bi bîra besdaran xist ku, ta niha sê hikûmeten Kurd ava bûne. Hikûmeta Şêx Mehmed Berzencî li Silêmaniye (1921), Komara Mahabadê (1946) û hikûmeta niha ya Başûr. Ev mînak ji, ji bo “rexnekirineke sergirti” didan. Hikûmeta Başûr wek serkeftineke doza Kurdî nirxand û daxwaziyên xwe wiha diyar kir: “Ger Bakur an ji beşike din i Kurdistanê di rewşa me de bûya, diviyabû ku em lê xwedî derketana. Em doza Kurd, welatê Kurd yek dibînin.”

Ereb Misirê ji xwe re wek navend, serek dibînin, her wiha Şair û Wezîr Bêkes, jestek ji Kurdên Bakur re kir û ev parce wek navend û serê beşen Kurdistanê nirxand. Bi gotineke din Bakur ji kir Misra Kurdan. Wiha digot: “Dijmin dema planen xwe li ser doz û meseleya Kurdi çedîkin, Kurdistanê yek parce dibînin. Her wiha divê em ji xwe wisa bibînin. Ger parçeyên Kurdistanê laşê me be, Bakur serê me ye, çavê me ye.”

Wezîrê Çandê li ser geleşeyen wezareta xwe û kemasiyên xwe agahîyan da, peyivî û pirsên der barê wê de bi awayekî ji nava xwe tê bersivandin. Li ser têkiyên. Wezareta Çandê ú Navenda Çanda Mezopotamyayê ú Enstî-



Wezîrê Çandê yê Hikûmeta Kurd a Federal Şérko Bêkes rojnameya me ji ziyaret kir. Bêkes xwest ku rojnameya Welat ji bo hemû Kurdan weşanê bike. Di wîneyê de bi xebatkarê Welat re tê ditin.

tuya Kurdi rawestiya. Daxuyan ku protokolek di navbera wan de hatiye ïmzekerin û mebest danus-tandina çalakiyên çandî, wêjeyî, hunerî û hwd. ne. Li ser vê yekê birek goventgêr, şanoger û kes û komên müzikê çûne Başûr, li ser navê NCM'ê.

## • YEKKIRINA ZIMAN Û ALFABEYÊ NE HESAN E'

Pirsa mijara yekkirina ziman û alfabetê ji hate rojevê. Bêkes hebûna zoravayan û alfabetê Kirîlî, Latînî û Erebî bi parçebûna Kurdistanê û rewşa wê ya siyasi ve girê da. Nehesânburûn û zorbûna yekkirina ziman û alfabetê diyar kir, gote ku bi bîryar û ferma-na wezîr an ji parlementoyê ev mijar çareser nabin. Lî dilkwaziya xwe ya Soranî ji bo zaravayê fermî ji bi van gotinan anî ziman: “Ziman bi siyasetê ve girêdayî ye. Di dîrokê de di dîrma Mirê Botan de Kurmancî, ya Ardalan de Goranî û ya Babanan de ji Soranî zimanî fermî bûye. Hêz û siyaset di destê kê de be ew zarava serdest e û divê ji bo hemû besan ji wisa be. Alfabe ji dijwar e ku, bê guherandin. Bi bîryar nayê guherandin. Divê selk ew bipejirîne.”

Lî di civîna ya ji bo çapemenî û weşanxaneyên Kurd de dîrokan û Serokê Yekîtiya Hiquqvanen Kurd İsmet Şerif Wanli bi me da hînkirin ku, rewşenbîrên Herêma Behdînan dixwazin bi Kurmancî û bi tipêni Latînî hévo-tina (perwerde) xwe bikin. Lî ev daxwaza wan tê redkirin û serdestiya Soranî tê parastin. Her wiha Birêz Wanli ev rewş bi si-yaseta hêzên mîtingehkar û im-

peryalîst ve girê da, hişyarbûna hikûmetê xwest ku. Tirkîyê ji naxwaze bi Kurmancî ders bêdayîn weşan bê kirin.

Di civîn û axaftinê Wezîr Şair Şérko Bêkes de, tişte ku balê dîlikşand, bêrawestan bilîvkîrina demokrasî li hev çavbardana kes û hêzân û cihêrengîya wan bû. Tim ji Başûr mînakandan di da û digot nakokên di nav kes, hêz û partîyan de hene divê bi riya rexnekirin, gengeş û nivisîn bêne helkirin, ne bi çekan. Di dema serdana xwe ya Welat de ji ev daxwaziya xwe anî ziman. Rast digot divê her welê be, lî li Başûr cinayetên “kiryar nedîyar” wek ên ku hêzên Tirk li hember gelê Kurdên Bakur dimeşîne, li Başûr ji hejmar her diçe zêde din. Di van cinayetan de kesen xuyanî, nas û siyasi tênu kuştin. Wek Mebûsê Aşorî, Serokê Partiya Têkoşin Rauf Akreî, Berpirsiyare PKI'ye û Endamê Komiteya Navendî ya Zehmetkê Rênas.

Wezîr û şairê birêz, di serî de xwest ku cinayetên “kiryar nedîyar” wek ên nesiyasi bide nîşan û xwe di çîçivand. Lî di dawiyê de pejîrand ku, du tişte jê ne razî bûne qewimîne. Yek jê ew cinayet û ya diduyan dadana rojnameya Welat ku li Başûr bi zarê Soranî û hefteyî derdiket.

Lî dîsa ji wezîr rewşa Başûr û Yugoslavya, Bosna Hersek, Afganistanê pêşberî hev dikir û xweziya xwe bi Başûr dianî ku ji wan welatan dîsa çêtir e. Heta pê de çû û got: “Li Swêdê ji cina-yetên bi vî cureyî çedîbin.”

Belê li Başûr her tişt serbest e, her kes dikare cihêrengbûna xwe ya fîkrî û ideolojîk bi riyan cur bi

cur bîne ziman; heta rojnameyên Sedam ku pesnîn rejîma Baas di-din dikarin bi serbestî bêne firotin li kuçe û kolanên başûrê welêt. Lî, rojnameya Welat qedexe di-be, derê wê tê danan.

Di dawîya civîna xwe ya bo çapemenî û weşanxaneyên Kurd de, li ser pirseke der barê hel-bestvîya wî de xwe ranegirt û bisîri, “Di civîn de pirseke tenê ya edebî hate pirsin. Min dixwest ku pirsên bi vî awayî zêde bûna.” got.

Bêkes pirsê bersivand û daxu-yand ku “Berê şair, pişte re wezir” e. Heta ne wezîr hikûmetê ye, yê gel e.

Cihê ku Şair Şérko Bêkes li wir be, dê ji helbesten xwe nex-wîne? Jixwe di serî de amade bû ji xwendina helbestan re. Lewre li ser pirsekê ku çewt têgi-hiyabû xwezokbûna xwe dabû der. Şairê navdar du helbesten xweji pêşkêşî besdaran kir.

Ha vê yekê ji, ji bîr nekir ku navbera Kak Mesut û Mam celal wek dixuye ewqas ne xerab e.

Belê me ji dixwest ku, em ji şairê xwe yi navdar bêhtir pirsên li ser wêjê huner û helbestan bi-kin. Lî dewranê ew wek wezîr herçiqas wî sifatê şairêye dixwest derxe pêş ji hatibû pêş me. Lewma barana pirsên siyasi lê rabû. Lî xwe zêde li ber lehiyê bi rengê xwe yi wezîr ranedigirt. Di reaksiyon, bilindbûn û nizimbûna axaftinê xwe de yê der barê bersivîn pirsên siyasi de bi bêhtiri dida nîşan. Di dawiyê de gihiştibûna xwe ya edebî bi me da pejîrandin, lî ji bo warê siyasetê em nikarin bîryareke erêni bidin.